

# nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat


Hejmar: 9

Sal: 1

Hezîran 1993

Bîha: 15.000 TL

# Yekitî fedakariyê dixwaze !



# ALFABEYÊN LATÎNÎ Û EREBÎ YÊN KURDÎ

LATÎNÎ	MÎNAK	EREBÎ	MÎNAK
A a	Agir	ا	ئاگر
B b	Bav	ب	باش
C c	Cil	ج	جل
Ç ç	Çay	چ	چای
D d	Dê	د	دی
E e	Evîn	ه	ئەڤین
Ê ê	Êzing	ي	ئىزىنگ
F f	Ferat	ف	فرات
G g	Genim	گ	گەنم
H h	Hêlîn	ھ	ھەلین
I i	Istêrk	-	ئىستىرك
Î î	Îlon	ي	ئيلۇن
J j	Jîn	ژ	ژين
K k	Kal	ك	کال
L l	Lorîn	ل	لۇرىن
M m	Masî	م	ماسي
N n	Nimêj	ن	نمىز
O o	Ol	و	ئۆل
P p	Pîr	پ	پير
Q q	Qelem	ق	قەلم
R r	Reng	ر	رەنگ
S s	Ser	س	سەر
Ş ş	Şîr	ش	شىر
T t	Tolik	ت	تۈلۈك
U u	Umêd	و	ئومىد
Û û	Ûr	وو	ئور
V v	Vala	ۋ	ۋالا
W w	Welat	و	وهلات
X x	Xebat	خ	خىبات
Y y	Yek	ي	يدىك
Z z	Zelal	ز	زەلال

Xwedî  
(Sahibi)

**MAHMUT YARLUĞ**

Berpisriyarê Giştî  
(Genel Yayın Yönetmeni)  
**SABAH KARA**

Berpisriyarê Nivîsaran  
(Sorumlu Yazışları Müdürü)  
**SÜLEYMAN ÇEVİK**

Mudîrê Tîpîzî û Arşîvê  
(Dizgi ve Arşiv Müdürü)  
**ALİ KARADENİZ**

Muşawirê Nivîsaran  
(Yayin Danışmanı)  
**MUSTAFA GOYAN**

Nûbihar kovareke mehanî ye ku bi  
weşandina karpêkên çanda Kurdî bi  
mâna tevâyî dilebike. Raman û rayên  
xwedyêñ karpêkan, lizûmen ne raman  
û rayên Nûbihar in. Nivîsarên ku bi  
îmzeya Berpisriyarê Giştî weya bi  
navê Nûbihar têñ weşandin raman û  
raya me nîşan didin. Em di serrastki-  
rina karpêkên şandî de azad in.

**BEDELA ABONETIYA SALINÎ:**  
Li hundir: 180.000 TL  
Li derive: 60 DM

**JIMAREYÊN HESABÊ:**  
Li hundir: Postgiro (Posta Çeki):  
Süleyman Çevik, 658265  
Li derive: Süleyman Çevik, İş Bankası  
Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-  
3118770

**NAVNIŞAN** (Adres):  
Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3  
Fatih - İstanbul

TEL: 533 75 88

FAKS: 524 00 38

**TÎPÎZÎ** (Dizgi):  
Nûbihar

**BERG** (Kapak):  
Döntüs

**ÇAPXANE** (Matbaa):  
Mutlu Ofset

## NAVEROK

### DESTPÊK

- Hejmara nehêmîn li me hemûyan pîroz be! ..... 3  
**nûbihar**

### SERNIVÎSAR

- Yekîti fedakariyê dixwaze! ..... 5  
**SABAH KARA**

### BERG

- Yekitiyeke çawa? ..... 7  
**SÜLEYMAN ÇEVİK**

### HEVPEYVÎN

- Bi romannivîsê kurdî Mehmed Uzun re hevpeyvîn ... 10  
**NESİMÎ ADAY**

### NIVÎSAR

- Sempozyoma Nûbihar:  
“Pîrsa kurdî çawa çareser dibe?” ..... 16

### FELAT DILGES

- Xizmetên giranbiha yên ku kurd ji ummeta  
islâmî re kirine ..... 19

### DR. FEHMÎ ŞINNAWÎ / HAYRULLAH ACAR

- Rewşa nuh û xorîn me ..... 20  
**AQIL MIHACIR**

- Ka mislimantiya ku Pêxember Muhemed  
pê hatiye? ..... 24  
**MELE HEMDİ**

- Rewşa kurmancî û zarokên kurd ..... 25  
**M. IRŞAD CÜDÎ**

### TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ

- Mele Ehmedê Bateyî ..... 22  
**ZEYNELABİDİN ZINAR**

### HELBEST

- Nameyên bêcewab / 7 ..... 4  
**SABAH KARA**

- Nuqurç ..... 8  
**MELA QASIM**

- Welatek hawêrxwêş ..... 9  
**FERHAT ABDULLAH**

- Hêvîdar ..... 9  
**RAİF BÊÇARE**

- Cindên Şêx Seîd ..... 18  
**M. ŞAKİR KOÇER**

- Gazin ..... 15  
**ABDULLAH AYDIN**

- Ji Seîdê Norsî re ..... 21  
**EKREM SÊWASI**

### ZAZAKÎ

- Vilî çilmiskyenê ..... 29  
**OMER FARUK ÇETINKAPLAN**

- Riyê xwu bisaw azmîn ..... 29  
**MUHAMMED PAŞA**

### ZAROKNAME

- Rûpelek ji exlaqê Pêxember ..... 27  
**EBDILLAH AMED**


- Çirçirîk û mérû ..... 27  
**LA FONTAINE / IRŞAD SEYDA**

- NAMEYÊN WE ..... 30

- FERHENGOEK ..... 31

- RÊZEPIRS ..... 32

**ALİ KEÇELİ**



Ji BOCURGAT

# HEJMARA NEHEMÎN LI ME HEMÛYAN PÎROZ BE!

**S**ikir ji Xweda re ku vaye em gihîştin hejmara nehan; bi umêda umreke pir dirêj û pir bi seme-

re!

Hevalno!

Weke ku hun zanin, em dixwazin ku di her hejmara xwe de li ser pirseke gi-ring û muhîm bisekinin.

Em di vê hejmara de li ser yekitiyê, yanê li ser wehdetê disekekin.

Nêta me ewe ku em di hejmara xwe ya hatî de jî li ser sempozyoma ku me bi navê kovara me Nûbihar di tarîxa 16.5. 1993 de li Stenbolê tertîb kir, em bisekinin. Lêbelê hun ê di vê hejmara me de jî bi şiklê nûçê, nivîsekê di heqê vê sempozyoma me de bixwînin.

Hevalno!

Me nêt kiriye ku em ji bona salvegera weşanda kovara me Nûbihar, pêşbaziyekê, yanê musabeqekê tertîb bikin.

Mijar, yanê mewzûya pêşbaziyê, "Bikaranîna zimanê kurdî di weşanan û hemû aliyên jiyanê de, ci tasîrî li ser kurdan dike?" ye.

Pêşbazî ji nuha ve dest pê kiriye.

Yênu ku dixwazin têkevin vê pêşbaziyê, lazime nivîsa xwe ya bi zimanê kurdî ya ku gereke ne zêdetirî sê rûpelan (3 sehîfeyan) be û bi daktîlo hatibe tîprêzkirin, heta taliya meha tebax (agustos) ê bişînîn navnîşana kovara me.

Em cardin tekrar dikin ku

ber çavan bigrin.

Nivîsarênek yekemîn û du-yemîn û sêyemîn, di hejmara me ya 13'an, yanê hejmara ewil a sala duduyan de wê werin îlankirin û piştre jî wê werin weşandin.

Em ê xelatên pêşbaziyê jî di wê tarîxê de pêşkêşî nivîskaran bikin.

Hevalno!

Bihaya kovara me ji vê hejmara û pêve, bû 15.000 TL.

Ev zemanek e bûbû pêwîstiye kovare bilind bikin; lewra him kaxez, him çap û him jî mesrefen din di vê muddetê de pir bilind bûn. Loma em mecbûr man ku bihaya kovare bilind bikin û abonetiya salinî, bikin 180.000 TL. Lêbelê em ê firsetek din jî bidin xwendevanê xwe... Yênu ku heta taliya tûrmeh (temmuz) ê bibin abone, wê cardin 120.000 razînin.

Bihaya abonetiya salinî ji bona yêni li derive jî, bû 60 DM.

Em umêddar in ku hun ê me mazûr bibînin.

Heta hejmara hatî...

Selam li we hemûyan!

**nûbihar**



gereke nivîs ji sê rûpelan ne zêdetir bin û bi zimanê kurdî bin.

Di helsengandina nivîsan de, bi qasî mijarê, em ê us-lûb, rêziman û edebîbûnê jî li

# NAMEYÊN BÊCEWAB / 7

## 14 Sibat 1991

Eger bibêjim ku ez ji nijadekî me ku ev sedsalan in  
Zimanê zarokên wî hatiye birrîn, tu bawer nakî  
Bavê min mîna ku ji şewatê birevîne ez revandim  
Ji bona ku ez kul û derdê hemû zemanan bi zimên bînim

Loma ez her sibeh ji xewê li betalê hişyar dibim  
Her sibeh hişyarbûn ji xewa ku nizanim ez çawa ketimê  
Û ji Ashabê Kehf bûna min, bi adeta ku ji zaroktiyê ve maye  
Ji vê yekê ye tim î tim, ji vê yeka ha ye, erê

Bi bavê xwe yê ku min ci kitêban li ber çonga wî xwendîye  
Zaroktiyeke bê hed û hesab a ku di şikeftekê de buhurt  
Ji bona ku navê min jibîr bibe, jibîr bibe ku ez dijim  
Ji bona wî wextî ku bigihêjin azmanan qîrînê min

Ez zimanê kiyan im, bibêjim tu bawer nakî  
Bi dewsâ şîr, ez bi hêstirê çavan têr bûm, bibêjim tu bawer nakî  
Bi dengê nalînan dilerizî şikefta me tim î tim  
Min bi dewsâ bûkikan, zarokên bi xwîn kefen dikir, bibêjim tu bawer nakî

Min wisa ji şûr mayiyêñ talanan dîtin ku her roj sê nifşan  
Gereke hinin bînin bîra min ku em mirov in  
Gereke erd û azman û av û bayê bînin şahidiyê, da ku ez bawer bikim  
Ku merhemet nemiriye, şeref biqîmet e û evîn nemiriye

Loma wextê ku ez dipeyivim dengê himhima hinan bilind dibe  
Loma zimanê alemeğistî yê erd û azmana ye dengê min  
Ez nikarim bêdeng bimînim, lewra wê mehf bibin xezal bi bêdengiya min  
Lewra hemû ew zarokên lal, li devê min dinihêrin, ez zanim

### Sabah Kara

# YEKITÎ FEDAKARIYÊ DIXWAZE!

## Sabah Kara

**M**a kes heye ku pêwîstî û li-zûma yekitî û hevgirtina hêz û grûbên Kurd û hemû mazlûman qebûl neke? Bê şik, ti şexsê birûmet nikare vê pêwîstiyê red bike. Hewcedariya bi yekitiyê, ne qabil û redkirinê ye.

Her kes zane, pir tiş hene ku bêyi yekitî û hevgirtineke bi şida, ew bideset nayin. Lîbelê bila bidesamîna tiştina li dera habe, neyekbûn û hevnegirtin bi xwe jî, bela û astengiyeke pir mezin e.

Yanê em ji du aliyan ve hewcedarî yekitiyê ne.

Him ji bona ku em nebin manî hevûdu, em hewcedarê yekitiyê ne û him jî ji bona ku em bikaribin tiştina pêk bînin, em hewcedar in.

Ez bawer im ku her kes vê heqîqetê zane.

Baş e, lê naxwe çîma yekitî têra xwe pêk naye?

Em dibînin ku hemû kes û civak bi yekitî û hevgirtinê îlan i eşq dikin, yekitî û hevgirtinê dixwazin; lîbelê yekitî cardin jî bi heddê kafî pêk naye.

Çîma?

Sebeb pir in. Lî bi baweriya min esas sebeb ev e ku kes û civakên me ne hazir in ku ew bi xwe fedakariyê bikin û tim û tim fedakariyê ji dîgeran dixwazin. Ew bi xwe naxwazin ku bal kesê din ve herin, lîbelê dixwazin ku her kes bal wan ve biçe. Naxwazin di teleb û xwesten xwe de

her grûb li yên din ên ku gereke hevaltî û arîkariya wan bikin, bi musamehe û tolerans nêzîk bibin û bikin ku ev dûrî û ji hev cudabûn, ji holê rabe.

Ji bona ku em bikaribin bigihêjin derina, ev cur yekitî şert e. Lîbelê ev yek naye wê manayê ku em ê ji prensîbê xwe yên esasî tawîz bidden. Lewra merivê ku ji van cur prensîban tawîz dide, şexsiyeta xwe jî ji dest dide. Lîbelê kesê ku şexsiyeta xwe ji dest da, kérî ti tiştî naye. Karêni bi mana, karê kesen birûmet û bişexsiyet in.

Merivê ku ji prensîbê esasî tawîz dide, vê tawîzê ji bona ci dide? Ma meriv kare ji bona tiştîn ne esasî, ji tiştîn esasî tawîzê bide?

Naxwe berî her tiştî gereke em prensîbê esasî û yên ne esasî yî xwe tesbît û muşexxes bikin. Ji bona ku em ji bo tiştine ne muhîm hevûdu neşkinin û li hemberê hevûdu nesekinin, ev yek, şert e.

Bi navê xwe, prensîbê me yên esasî ev in:

Yê ku dixwaze bi me rebe, gereke li rûmet û şexsi-



musamehekár û bitolerans bin, lîbelê dixwazin ku her kes bimusamehe û tolerans li wan binihêre û biçe hal wan ve. Lî hema wextê ku tu di vî half de bî, dê çîma mirovên din werin bal te ve û dê çîma li hemberî vê bêtoleransî û nemusamehekariya te, bitolerans û bimusamehe bin?

Naxwe gereke her kes û

yeta xwe xwedî derkeve.

Yanê gerek birûmet û bisexsiyet bije.

Gerek ti tiştî korekorane qebûl, yan korekorane red neke.

Gerek hazir be ku eger heq û heqîqet di eleyhê wî, yan teresdar û alîkarê wî de jî be, bi hêsanî bikaribe heq û heqîqetê qebûl bike.

Gerek bê şik û terdîd bikaribe tiştê ku ji xwe re dixwaze, ji mirovî din re jî bixwaze û tiştê ku ji xwe re naxwaze ji ti mirovî re naxwaze.

Em nikarin bi ti wech û ti şiklî bêedebiyê qebûl bikin.

Gerek em bi şikleke qet'î û birinî bawer bin ku, yê bêedeb, bêyî her qencî û spehîtiyê ye.

Ne lazime bête gotin ku, sexsê bêedeb, helbet ku bêdîn e jî.

Lewra dîn, beriya her tiştî, edeb e.

Yê ku edeba wî nehe, di heqîqeta esil de, dînê wî jî tineye.

Heq ji her tiştî bilindtir e. Ti tişt ji heq bilindtir nîne. Xweda ji ber ku Heq e, bilind e.

Bêrehmî, bêmerhemetî, bi her şiklî xwe ve merdûd û xebîs e.

Em nikarin bi bêrehman re

pevre bin.

Zanîn muqeddes e; lê teleb û xwestina zanebûnê, ji zanînê jî muqeddestir e. Lewra mifta zanînê, di teleb û xwestina zanînê de ye.

Dibe ku em bi nezaniyê tehemul bikin; lê bi telebnekirina zanebûnê em bi ti wechî nikarin tehemul bikin. Lewra bi xwestin û telebkirina zanî-

di vê riyê de bixebite, welew ne xwedyê van tiştan jî be, kare bi me re be û em karin bi wî re bin. Lewra wextê ku meriv bixwaze, kare bibe xwedyê van xusûsiyet û xesletan.

Yê ku dîrokê balî xweşî û dilgeşiyê de guhert in, xwedyê van xesletan bûn.

De heydê birano, werin da ku em xwe ji bin vê zilma bêşerefane xilas bikin!

Werin da ku em insan û dar û giya û erd û azman û her tiştên din, ji destê xebîs û rezîl û bêşerefan xilas bikin!

Yekîti fedakariyê dixwaze; lêbelê fedakarî jî muqabele dixwaze. Wextê ku we fedakarî kir, lê terefê muqabil hûc bal we ve nehat û hazir nebû ku fedakariyê bîke, hun nikarin fedakariya xwe îlel ebed bido-mînin.


Werin birano, eger hun gavekê balî me ve werin, bawer bin ku em ê çend gavan balî we ve bêñ!

Naxwe eger hun van şertên jorê qebûl dikin, werin!

Hun ci bin û di kîjan fikri de bin, werin!

Lewra ev dergehê me, ne dergehê naumêdiyê ye.

Werin! □



ne, meriv kare nezaniyê ji holê rake; lêbelê wextê ku meriv zanînê naxwaze û teleb neke, tim ë tim nezan dimîne.

Erê, diyar e ku ev şertana giran in; lê yekitiyeke bêyî vana, bêmana ye, ti xêr jê na-ye. Lêbelê xwestin muhîm e. Yê ku van tiştana bixwaze û

# YEKITIYEKE ÇAWA?

Süleyman Çevik

**Y**ekiş tim di rojeva miletên mazlûm de ye. Ferden van miletan li ser yekitiyê behsa hevxebatê dîkin, fîkrêñ xwe dibêjin û xebatan dîkin. Her kes dizane ku heta miletek bindest û mazlûm qewet û hêzên xwe yek neke, ne mumkin e ku rizgar bibe. Bi rastî yekitî dilxwaziya miletên mazlûm tenê nîne. Ji grûbêñ piçûk bigire, heta sazgehêñ mezin, hemû dixwazin ku nav xwe de yekitiyê zexim bînin holê.

Kurd ji îxtîlafan pir kişandine. Mirin, qetlîam, koçberî û birakujî her wext ji îxtîlafan hatiye serê Kurda. Ez bawer im ku heger Kurd di nav xwe de diyalogê û hevûdu guhdarkirinê bimeşînin, emê pir îxtîlafan ji nav xwe rakin. Wî wextî her kes wê heq û huqûqê xwe û wê hedê xwe bizanibe.

Xwedê Teala mirov cur cur xuluqandine. Li ser ren gan, fîkran, xwarinan, welhasil zewqan, ne mumkin e ku yekitiyek saz bibe. Her kes ji tiştekî hez dike, yan jî hez na-

ke. İro em li kîjan welatî yan jî miletî binêrin, nav wan de cur cur partî, grûb û cemaet hene. Ev rastiyek e û gereke neye înkarkirin. Di welatê me de jî ev rastî heye. Em nav hev de dijin, mirovê hev in, cîranê hev in, birayê hev in. Bi van cemaet yan jî grûban re şert e ku em diyalogê çêkin



û hevûdu fam bikin. Heger ne wisa be, em ê her wext di cihê xwe de bimînin.

16 Gulan 1993 de li Sten bolê me li ser Pirsa Kurdî sempozyumekê çêkir. Ji pir grûban mirov hatibûn. Û ji bo famkirina hevûdu, tiştîn xweş hatin meydanê.

Me barê dînyayê daye ser

pişta xwe. Ji pirsên dînyayê re em li çareyan digerin. Dilê me bi hemû miletên bindest dişewite, em xwe bi mazlûmiyeta miletên din ve dîkin heval û ji bo pirsên wan xebatan dîkin. Ji wan re dişuxulin û dişewitin; lê ji xwe re na! Em ji xelqê re hene, lê ji xwe re tinene. Lazime ku biqasî ku ji xelqê re em hene, ji xwe re jî hebîn. Em ji xwe re çi dixwazin, ji miletên din re jî dixwazin. Ev destûreke îslâmî ye jî.

Em bi misilman re birane, lê ev biratî bi rastî ji me re biratî û yekitiyêke bi şîklê ku em dixwazin neaniye holê. Miletike sî milyon li ser erdê xwe ji her tiştî mahrûm e. Kesêñ ku vê rastiyê qebûl nekin û ji Kur dan re van heqên însanî nexwazin, ne mumkin e ku em bi wan re biratiyêke rastî binîn holê. Rêya me jî heta cihekî bi wan kesan re diçe.

Kesêñ ku êrifî dînê me bikin, li hemberê îslâmî derkevin, ji dînê îslâmî re neyartiyê bikin, li hemberê xwe wê me bibînin û ne mumkin e ku em

bi wan re bibin yek. Lewra kesên ku baweriya me ji xwe re neyar qebûl bikin, me jî ji xwe re neyar qebûl dikan.

Kesênu ku mafênu Kurdan qebûl nakin, ji xwe re çi dixwazin heger ji gelê Kurd re jî nexwazin, em bi wan re jî nikarin bibin yek. Kesê ku miletê me û hebûna me qebûl neke, emê çawa pê re yekitiyê saz bikin.

Heta ku ji me têt, em jiyanâ xwe li gor îslamê dimeşînin. Lê em miletê xwe jî încar nakin. Em zanin, yê ku miletê xwe încar bike, bê esl e. Madem zimanê Kurdi Xwedê Teala daye me û em Kurd xuliqandine, naxwe bikaranîna hemû heqên milî jî daye me. Em dibêjin her kes xwediyê çi heqiyê bin, lazim û şert e ku Kurd jî biqasî wan xwediyê heqan bin. Heger biraşî ye, huquqê biratiyê ev e. Di vê çerçevey de heger em yekitiya Tirk, Ereh û Parsa lazim û şert dibînin, yekitiya Kurdan jî gereke em wilo bibînin.

Yekitiya Kurdan em girîng dibînin û ji bo vê yekitiyê tiştên ku ji me tênu, divê em bînîn cih. Bi baweriya min, heta yekitiya Kurdan çênebe, yekitiya mislimanana jî çênebe. Lewra Kurd di nav miletên îslamê de hem bi nifûsa xwe pir, hem jî ji hemû miletan zêdetir dîndar in. Heger em yekitiya Kurdan nikarin bînin holê û em ji yekitiya mislimanen behs bikin, ev tişteke beyhûde ye.

Em tim dibêjin, Kurd misliman in û bi bendeke zexim bi îslamiyetê girêdayî ne. Heger ji bil îslam, ji devekerê din ji Kurdan re çareyan em bigerin, bi rastî ne Kurd vê çewtiyê qebûl dikan, ne jî ti

# NUQURC

Mêro bi vê islama ku tu dawa wê dikî  
Tu Xweda aciz dikî, mirovan ji rê dikî  
Wellahî dînê min û dînê te ne ji hev in  
Ez li avê digerim, lê tu agir rê dikî

21 Gulân 1993

Mela Qasim

## PêŞBAZÎ

Bi munasebeta salvegera yekemîn à kovara me Nûbihar, me pêşbaziyekê, yanê musabeqekê tertîb kirîye.

Mijara vê pêşbaziyê, "Bikaranîna zimanê kurdi di weşanan û hemû alyîn jiyanê de, ci tasîrî li ser kurdan dike?" ye.

Gereke nivîsar bi zimanê kurdi bêtin nivîsandin û ne zêdetirî sê (3) rûpelên daktîlo bin.

Lazime nivîsar heta taliya meha tebax (agus-tos) ê bigihîjin destê me.

Nivîsarên 1. û 2. û 3. di hejmara 13'an de wê werin îlankirin.

Em ê xelatîn pêşbaziyê jî di wê tarîxê de pêşkêşî nivîskaran bikin.

**nûbihar**

kes di vê mijarê de serfiraz dibe.

Miletik wisa bi îslamê girêdayî ko li Tirkîyê, Îranê, Iraç û li Sûriyê nav xwe de yekitiyê saz bike, ez bawer im ku wê ev li fêda mislimanen be û ji bo yekitiya mislimanen jî wê zemîn hazir bike. Lewra yekitiya mislimanen

dinyayê di merhela dawîn de armanca hemû mislimana ye. Em dixwazin ku hemû mislimanen dinyayê werin cem hev, qewet û hêzên xwe yek bikin; bi biratiyekê rastî, ne ya sexte, hemû milet bi wekhevi di hawuza îslamê de bijîn û yekitiyekê nav xwe de saz bikin. □

# WELATEK HAWÊRXWEŞ

Min çiqas  
 Pirr dixwest  
 Ku ez bi  
 Dîcle û Ferat re  
 Li çiya û zinar û  
 Deştan bigerrim  
  
 Li Cizîra Bota  
 Li devê çem  
 Li ber  
 Birca Belek  
 Ji nû ve  
 Jiyân bidîta  
 Evîna  
 Mem û Zîn  
  
 Ez bibûma  
 Bilbilek û  
 Ez bigerriyama:  
 Min evîna  
 Ferhat û Şêrîn  
 Ji nû ve  
 Bidîta  
  
 Li çiyayê  
 Sîpanê Xelatê  
 Di şûnde  
 Xwînê de  
 Di demarêن xwe de  
 Ez bihesiyama  
 Evîna  
 Siyabend û Xecê  
  
 Min li wan  
 Zozanêن xweş

Li ser çêra  
 Bi berf  
 Xwe dirêj kira  
  
 Li çiyayê Agirî  
 Ji nû ve  
 Ji min re  
 Xuya bikira  
 Keşta Nûh  
  
 Li Wanê  
 Li devê golê  
 Min asoyiyan bida  
 Ber dile xwe  
  
 Ez tev  
 Van evînan  
 Ji dengê  
 Erebeyan  
 Ji pîsîtiyên  
 Fabrîqan  
 Jibihna  
 Raffineriyan dûr  
 Bijîma ji nû ve  
  
 Çerxên zeman  
 Bi paş ve  
 Bigerriya  
 Ji nû ve  
 Jiyân bidîtina  
 Ev tev evîn  
 Di xwîna  
 Min de  
 Bi hawêrxweşıya  
 Welat.

Ferhat Ebdullah

# HÊVÎ- DAR

Ji xelqê re mal û war  
 Kes ji wan re nabe bar  
 Him bi dilê xwe dijin  
 Ji wan re heye sitar  
  
 Ew xwînxwarê tim neyar  
 Li me bûne gurê har  
 Bê însaf in ji me re  
 Wan dijminê har kedxwar  
  
 Zivistan e li me sar  
 Ka li kû ne dost û yar  
 Qey kes guhê xwe nadê  
 Ku em dîkin zarezar  
  
 Wan zalimê pirr dijwar  
 Em kirine parepar  
 Li ser van rê û dirba  
 Dîsa'm mane stûxar  
  
 Zordesta xwîna me xwar  
 Li me bûne hirç û mar  
 Xelqê heqê xwe hilda  
 Para me ma kulm û dar  
  
 Ey Rebê Heq û Qehhar  
 Bişîne me re hawar  
 Çavê me l'rehma Te ye  
 Me nehêle birîndar  
  
 Dû zivistanê bihar  
 Wê derbas be ev êvar  
 Sibe b'emrê Xweda ye  
 Tu rast bajo Nûbihar

Raîf Bêçare

Romannivîsê kurdî Mehmed Uzun:

# “ÎNSANIYET, XWEŞÎ Û SERFIRAZIYA MERIVAN, WEKHEVÎ Û BIRATIYA ZIMAN, ÇAND Û EDEBIYATAN; DIVÊ HİMÊN ESASÎ YÊN EDEBIYATA KURDÎ Û NIVÎSKARÊN KURD BIN”

— *Heta niha çend kitabên te çap bûne û li kû derê weşiyane?*

— *Heta niha pênc kitabên min weşiyane. Ji Destpêka Edebiyata Kurdî (Weşanxana Beybûnê) pê ve yên din hemû li derveyî wellêt weşiyane. Lê du romanê n min, Siya Evînê û Rojek ji rojêni Evdalê Zeynikê jî, bi dû re, li Tirkiyê, ji aliyê Weşanxana Doz'ê hatine weşandin.*

— *Tu dikarî ji bo xwendavanên me, hinekî behsa romana kurdî bike?*

— *Herwekî ku hûn jî dizanin, edebiyata kurdî di warê gotin û vegotinê de dewlemend e. Edebiyata devkî pir xurt e. Şîhîra klasîk hem pir*

## PORTRE

### MEHMED UZUN KÎ YE?

Mehmed Uzun, 1953, Siwerek, heta niha berpirsiyarî û gerfînendeyîa çar kovar û rojnameyên çandî û edebî yên kurdî kiriye. Wî di gelek weşanên kurdî, swêdî û tirkî de nîvîsarên çandî û edebî nivisîne. Heta niha çar romanên wî, bi kurdî, derketine. Ew endamê PEN-Klûba Swêdî, Yekitiya Rojnamevanê Swêdê, Yekitiya Rojnamevanê Cîhanê û endamê Komîta Birêvebir a Yekitiya Nivîskarên Swêdê ye. Ew li Wezareta Çandî ya Swêdê, mîna pisporê edebiyatên biyanî, dixebite.

#### ROMANÊN WÎ:

1) *Tu*, 1985. 2) *Mirina kalekî rind* 1987. 3) *Siya evînê*, 1989 Swêd û 1992 Weşanên Doz, Stenbol. 4) *Rojek ji rojêni Evdalê Zeynikê*, 1991 Swêd û 1993 Weşanên Doz, Stenbol.

#### LÊKOLÎN:

-*Destpêka edebiyata kurdî*, 1992, Weşanên Beybûn

#### WERGER:

- *Zimanê Çiya* (Mountaign Language), Harold Pinter, 1990 Weşanên Doz, Stenbol.

xwes, hem jî pir fireh û kûr e. Lê mixabin pexşana (nesîr) kurdî ne ewçend xurt e. Ji ber sebebêna nas, kurdan îmkanên xwendin û nivisîna kurdî nedîtine. Zimanê kurdî nebûye zimanê perwerdeyî, zimanê dibistan û zanîngehan. Loma jî, iro di warê xwendin û nivisîna kurdî de zehmetiyê

en nû, di warê roma-nê de jî pir li paş maye. Heta meriv dikare bibêje; di edebiyata kurdî de warê herî zêde paşdemayî, roman e. Iro meriv dikare romanên ku bi zimanê kurdî hatine nivisîn, bi tiliyê destan bihijmêre. Milletekî ku ji 20 milyonan zêde ye, iro bi tenê xwediyê çend roma-

nan e.


Eger meriv behsa romanê kurdî bike, divê meriv behsa romanê Erebê Şemo, Eliyê Evdrehman, İbrahîm Ehmed, Rehîmê Qazî, Husên Arif, Mihemed Mukrî, Mahmud Baksî û Şahînê Bekirê Sorekîlî û hwd bike. Di kurte-lêkolîna m i n Destpêka Edebiyata Kurdî de hin agahî li ser van nivîskar û berhemên wan hene. Loma ez naxwazim li vir behsê dirêj bikim. Gotina kurt ev e; tarîxa romana kur-dî pir nû ye

û ew ne dewlemend e. Ez bi xwe vê yekê kêmâniyeke pir mezin dibînim. Zimanekî mîna zimanê kurdî ku evçend perçiqiye û evçend li paş maye, dikare bi hunera romanê di demeke pir kurt de pir bi pêşde bikeve, xwe nû bike û dewlemendiyê nû bi dest xîne. Ji ber ku roman, warê ceribandina ziman e, avakirina şêwe û stîlên nû ye. Roman, riya herî baş a pêwendîya xwendevanan e. Bi alîkariya romana kurdî, kurd dikarin hem edeta xwendina zimanê kurdî ava bikin û hem jî jiyanekê nûjen a ronakbîrî bînin pê.

— Temaya bingehîn a romanê te însanê kurd û jiyana wî ye. Gelo navêna mîna Memduh Selîm Beg, Evdalê Zeynikê xîtabî kîjan aliyên însanê

kurd dîkin? Tu dixwazî di şexsênen gehremanê weha de tîpoloziyeke çawan rêberî xwendevanen xwe biki?

— Rast e, hin romanê min li dora şexsiyeten nas ên kurdî ava bûne. Nas yan jî ne-nas, lê ez dikarim bibejim ku



romanê min li dora "problematîka" ronakbîrê kurd derin û tê. Ji mêj ve ye, bala min her li ser ronakbîrên kurd, tarîx û pêwendî, xebat û tecrube, qayide û xusûsiyeten wan e. Li hemî dinyayê, her-tim, ronakbîr bûne rêherên medeniyetê û tevgerên çandî, edebî, siyasi û civakî. Wan nivisîne, ava kirine, xelkê xwe perwerde kirine û li gora bernamên xwe, ew bi rê xis-tine. Li ba kurdan jî ev, her weha ye. Lî bi baweriya min, bîr û zanîna tarîxa ronakbîran û ronakbîriyê li ba kurdan ewçend ne xurt e. Û mil-letekî ku tarîxa xwe baş ni-zane, şexsiyeten xwe baş nas nake, bi tarîx û berhemên ronakbîrên xwe re pêwendîyeke xurt nayine pê, ew millet nikare xwe ji nîr, asteng û di-

wariyan rizgar bike. Mîna millet û însan, kurd xurt û jîr e, ji bo mirin û kuştinê yekta ye. Lî ne ji bo xwendin, eser û berhem, parastina tarîx, medeniyet û kitabxanê. Ji Kse-nefon û vir ve, herkes behsa vê rastiyê dike. Bi baweriya

min, di roja iro de divê ev rastî bête guherandin û aliyên xwendin, felsefe, edebiyat, çand, şuur û za-nînê bête xurtkirin û têkûzkirin.

Memduh Selîm Beg û Evdalê Zey-nikê du şex-siyyetên kurd in. Yek za-ne, bîrewer

û ronakbîr, yek jî dengbêjekî navdar e. Yek bi xebata siyâsî, xwendin û nivisînê mijûl bûye, yê din bi gotîn, stran û çîrokê. (Ji me çend kesî navê Memduh Selîm Beg bihîsti-bû?) Ti têkilî û pêwendiyê wan bi hev re nîn ìn, lê herdu jî navêna tarîx û civata kurdî ne. Jiyan, berhem û xebatên wan dikare ji bo însanê iro bibe tecrube û nimûneyeke baş. Xwendevanê/a kurd ê/a iro dikare bi alîkariya wan hem tarîxa xwe û hem jî xwe baş binase û hem jî pêşeroja xwe. Ji ber ku merîvê tarîxa xwe, rabirdûya xwe nas ne-ke, kor e û nikare pêsiya xwe jî bibîne...

Béguman e ku ez roman dînîvisim, ne tarîxa leheng û gehremanan. Ji lewre ez ni-karim taswîr û saloxdana qeh-

remanan bikim. Qehremanê romanê min, bi her aliyêne xwe, mîna me ne. Diger meziyetên wan ên baş, kêmân û qisûrên wan jî hene. Ew însan in. Û tarîx jî, tarîxa însanan e.

- *Tu romanêne xwe bi zaravayê kurmancî dinivîsîne. Gelo romanêne te bi zaravayêne din jî derketine?*

- Naxêr, ew hê bi zaravayêne din ên kurdî neweşîyane. Lê Rojek ji rojêne Evdalê Zeynikê transkrîbeyî soranî bûye û niha jî hevalekî wê transkrîbeyî dimilî (zazayî) dike. Siya Evînê jî transkrîbeyî soranî dibe û haziriya yên din jî dibin.

Hûn dizanin, pêwendî di navber zaravêne kurdî de ewçend xurt nîn e û ûmkanêne ve guhezandinê jî ne zêde ne. (Bitenê li Kurdistana Iraqê ev ûmkan bi dest ketine.) Di vî warî de jî kurd hê di destpêkekê de ne. Em divê eser û berhemên xwe vebiguhezînin ser zaravayêne xwe yêne curbecur. Pêwendî divê di navbera zarava û devokêne kurdî de xurt û jîndar be. Ji bo yekitiya ziman û edebiyata kurdî jî ev yeka hanê pir pêweste. Digel sebebêne din, ji ber vê sebebê jî, min, tevî gelek hevalêne din ên nivîskar, ziman û edebiyatnas, anatolojiyeke edebiyata kurdî ya nûjen (1900-1992) amade kiriye. Tê de hem nivîskarêne ku bi zaravayêne curbecur dinivîsînin û hem jî perçeyin ji berhemên wan hene. Bi vî awayê, me hewl daye ku zarava û devok nêzîkî li hev bikin... Lê belê, hîn pir xebat divê...

- *Li gora ci tu babet û mijarêne romanêne xwe hildi-*

*bijêrî? Tu wan çêdikî, yan jî ji tiştên bûyî jî perçenin werdirî?*

— Berî ku ez dest bi nivîsina romanekê bikim, pêşî ez mefhûmên (concept) romanê hildibijêrim. Gelo roman ê behsa kîjan mefhûm, hîs û pêwendiyêne insanî bike? Pêşî vê yekê tesbît dikim. Piştî ku ev mesele di serê min de gihişt zelaliyeke pêwest, hingê ez dest bi lêgerîna leheng û bûyerên romanê û şêwe û stîla nivîsînê dikim. Ev jî, ji bo

li tespîtkirin û diyarbûna mijar, babet û lehengan dikin.

Hin ji bûyer, pêwendî û lehengên romanê min rast in, ew hebûne, jiyane û qewimîne. Lê hinêne wan jî çêkirine. Lê di vir de qayideyek heye ku ez dixwazim di xebata xwe de pir bala xwe bidimî; roman, esereke fîktîv, yanê çêkirî ye û ew li gora ûsila eserên fîktîv ava dibe. Ji ber vê yekê jî, divê bûyer, pêwendî û lehengên romanê, ger ew rast bin, ger çêkirî bin, li hunera romanê werin. Jixwe ferqa hunera romanê û tarîxê, yan jî ya romanê û sosyolojiyê di vir de ye. Di romanê de tarîx jî heye, lê ew ne tarîx e; sosyoloji jî heye, lê ew ne sosyoloji ye û hwd... Roman xîtabî hîs û pejnîn merivan dike, bi xwendevan re pêwendiyekê hîsî tîne pê.

Ez di romanêne xwe de, ji ber sebebêne ku min li jorê qal kirin, perçeyen jiyanê jibîrbûyî eserên rizayî, bûyerên bihûrî, stran û destanên windabûyî bi kar tînim. Ez wan jî direşînim nav romanêne xwe. Di romanêne min de ji rûpelên Zend-Avesta, Mishefa Reş, Quran, Hedîsên Pêxember, Şêxê Senan, Mem û Zîn, Dîwana Melayê Cizîrî, Hawar, Ronahî, Riya Teze perçenin hene. Gelek şexsiyeten kurd, bi gotinêne xwe, di romanêne min de hene. Sebebê vê yekê gelek in; roman, ji bo min, pêwendîya nivîsaran e. Nivîsar lehî ye, berhem cowen wêne. Romana kurdî divê rabirdûya windabûyî, ji nû ve, vejîne û wê yadîgarî xwendevanê kurd bike. Û di ser her tişti re jî romanêne xwe mîna helqeyeke biçük a zîncîreke dirêj, qehîm û kevnare dibî-

Mehmed Uzun

nim. Eger iro romanên min hatine pê, ew bi xêra yên berî min in. Ew nebûna, ez hîç nedibûm...

- *Tirkiyê gelek nivîskar û edebiyatnas, te û nivîskarê din ên kurd nenasin. Ti vê bi çi girêdîdî?*

- Kambaxiya rewşa Tirkiyê, zor û zilma li ser gelê kurd û ziman, çand û edebiyata kurdî li ber çavan e. Di rewşekê evçend xedar û nexweş de, nivîskarê kurd ê çawan û bi çi riyan bikaribe xwe bide nasîn? Eger em ev çend salêن dawîn bidin alî, bi hêsanî meriv dikare bibêje ku ziman, çand û edebiyata kurdî di hemû tarîxa Komara Tirkiyê de qedexe bûye. Kurdan fersend û îmkan nedîstine ku berhem û eser biafirînin û xwe bi xwendevan û gelê xwe bidin nasîn. Eger bala we lê be, hûn dibînnin; hemû nivîskarê kurd, ez jî tê de, li deriveyî welêt karibûne kîrhatî û karger bin. Ji ber ku li welêt şertîn vê yekê nebûne. Loma jî ne ecêb ê ku xwendevanê kurd û tirk li Tirkiyê nevîskar û hunermendêن xwe nasnakin.

Lê iro di vî warî de hin îmkan çêbûne; rojname û kovarê kurdî li Tirkiyê diweşin, weşanxanêن kurdî ava bûne, hin dezgeh û sazgehêن kurdî yên çandî û edebî çêbûne. Kovara wê jî tê de, berpirsiyariyeke mezin li ser milê van dezgehan e. Ew divê, zûtirîn wext, lê bi plan û bernâme, eser û berhemêن kurdî derxînin û bi gelê kurd bigihînin, nivîskar û hunermendêن xwe bidin nasîn û ji bo xebat û karêن wan ên çandî û edebî cîh û war amade bikin. Kurd bi xwe divê van karêن xwe

bikin û ji kesî tu alîkarî û piştigirtî nepêن. Heta meriv bi xwe tine be û ne xebatkar he, kes alîkarî jî nake...

— *Di edebiyata tirkî de, şexs û şexsiyetên kurdî mîna kesen hov, nezan, keleş û hwd. têن nasîn û taswîrkirin. Lê di van salêن dawîn de ev nêrîn diguhere. Gelo di edebiyata kurdî de jî, mîna ya tirkî, nêrînê weha hene?*

— Berî her tiştî dixwazim nêrîneke xwe ya li ser nivîsinê bibêjim; nivîsîna edebî tu carî divê li gora îdeolojî û dîstînê resmî nebe û li gora qayideyîn îdeolojiyan neafire. Ev îdeolojî dikare ya çînêن serdest yan jî çînêن bindest bin, her eyîn rewş e. Nivîsîna ku li gora îdeolojiyîn resmî hatine pê, mixabin, ne edebiyata bedew û hêja ye, ew pîraniya caran nivîsarê propaganda û ajîtasyona wê demêne. Ji faşîzmî heta komunîzmî, gelek îdeolojiyîn curbecur û li dijî hev, xwestine li gora nêrînê xwe, edebiyatekê bînin pê. Di dem û heymen xwe de, heye ku ew bi ser jî ketine. Lê gava ku desthilatiya van îdeolojiyan ji holê rabûye, edebiyata wan jî hêdî hêdî winda bûye. Aleman iro Thomas Mann û Herman Hesse dixwînin, ne nivîskarê kurd divê, bi tenê, di xizmeta ziman, çand û edebiyata welalet xwe û însaniyetê de bin. Nivîskariya serok, îdeolojî û komikan şixulê rojane ye û feyda vê celeb nivîskariyê ji xwediyan re jî nîn e. Însaniyet, xweşî û serfiraziya merivan, wekhevî û biratiya ziman, çand û edebiyatan, divê hîmîn esasî yên edebiyata kurdî û nivîskarê kurd bin. Gava nivîskarê kurd dijmina hî li ziman, çand û edebiyata tirkî bike, ew jî dibe "nivîskarekî kemalist" ê kurd. Me divê hay ji vê rewşa kirêt hebe û berhemêن me divê bibe pira bîrasî, wekhevî û dostiya ziman û çandan.

— *Hin nivîskar romanêن xwe li gora merc û şertîn xwe yên siyasi û civakî dînîvisînin. Meselen nivîskarekî İslâmî romanêن xwe li gora pî-*

jî beravajî ne. Kemalîzm û her celeb meriv û dezgehêن wê "medenî," lê kurd "wehşî" ne. Ew çêyiya kurdan dixwazin, lê Kurd wan fahm na-kin û li dîjî "çêyiyan" derdi-kevin... meriv dikare weha dîrej bike. Ci qîmet û hêjahiya vê edebiyatê heye? Ci pêwendîya vê edebiyatê bi însaniyetê heye?.. Iro rûmeta kemalîzmê ne mîna berê ye, bi taybetî jî di nav ronakbîrêñ pêşverû de. Loma jî edebiyata kemalîzmê iro ne mîna rûmetekê, lê mîna şermekê tê dîtin. Lê hê jî zirara vê edebiyata neînsanî li ser merivan pir zêde ye. Edebiyata kurdî û nivîskarê kurd divê di vî warî de jî gelek tişt bikin.

Eger em werin ser edebiyata kurdî û nivîskarê kurd, divê kurd xwe ji şaşî û çewtiyîn ku nivîskarê kemalist kirine, biparêzin. Nivîskarê kurd divê, bi tenê, di xizmeta ziman, çand û edebiyata welalet xwe û însaniyetê de bin. Nivîskariya serok, îdeolojî û komikan şixulê rojane ye û feyda vê celeb nivîskariyê ji xwediyan re jî nîn e. Însaniyet, xweşî û serfiraziya merivan, wekhevî û biratiya ziman, çand û edebiyatan, divê hîmîn esasî yên edebiyata kurdî û nivîskarê kurd bin. Gava nivîskarê kurd dijmina hî li ziman, çand û edebiyata tirkî bike, ew jî dibe "nivîskarekî kemalist" ê kurd. Me divê hay ji vê rewşa kirêt hebe û berhemêن me divê bibe pira bîrasî, wekhevî û dostiya ziman û çandan.

— *Hin nivîskar romanêن xwe li gora merc û şertîn xwe yên siyasi û civakî dînîvisînin. Meselen nivîskarekî İslâmî romanêن xwe li gora pî-*

vanen İslâmî dînivîse. Ev yeka ji bo komûnîstekî, yan jî ataîstekî jî derbas dibe. Mercû şerîn te yê çandî û şexsî çiqas tesîr li romanên te di-kin? Pîvanen “universalîzma” Mehmed Uzun ci ne?

— Ev pirsa we, pirsa jorîn temam dike. Bersîva min jî dê bersîva jorîn temam bike. Herwekî ku min got, bêgu-man e ku rewşa rojanê ya siyasî, şexsî, civakî, çandî, tesîr li nivîskar dike. Ü heta derecyekekê ev tesîr di nav eser û berhemên nivîskar de jî dixuyin. Lê bi baweriya min, bi tenê divê hewqas be, ne zêde. Ez bi xwe ne li dijî “edebiyata çîn û îdeolojiyan” im. Ji bervajiyê, ez van jî mîna dewlemendîyeke jiyanâ çandî û edebî dibînim. Milletekî ji gelek dîtin, kom û grûban tê pê. Zimanekî jî ji gelek zarave û devokan tê pê. Hebûn û çalakiyên wan, dewlemendî ye. Lê eger gotin were ser hêjahî û kalîta wan a edebî, hingê şikên min pir in. Ez nikarim li kesî tawsîye û şîretan bikim ka ew ê çawan binivîsîne. Lê ez dikarim ji bo xwe bibêjim; ez tu carî naxwazim bibim “nivîskarê dîtin û grûban” û li gora wan dîtin û grûban binivîsim. Ez di xizmeta ziman, çand û edebiyata kurdî de me, bi kêfxweşî xizmetkariya wan dikim. Ü pêşketina wan serfirazî û kêfxweşîya min a herî mezin e. Di ziman, çand û edebiyata kurdî de ne bi tenê dîtinek yan jî grûbek, gelek dîtin, grûb, çîn û teheqe hene. Ew hebûnen hemû kurdan in. Ez ji bo hemûyan dinivîsim. Ez dixwazim, bi qasî xwendevanekî nûjen, seydayekî gundê herî dûr, bi qasî xwendevanekî “çep”, xwendeva-

nekî “islamî” jî bibin xwendevanen romanen min.

Her mîna we, carina li derin din jî, ji min dipirsin ka îdeolojî û dîtinê min ci ne, ez bi Kîjan kom û grûbî re me. Helbet, li gora min, dîtinê min ên şexsî hene û di jiyanâ xwe ya şexsî de jî hin tiştan dikim. Lê ez nikarim berhemên xwe bikim qurbanî van dîtinê şexsî. Ev ê karekî gelek basît be. Nivîskariya min divê li gora qayideyên edebi-



yatê û ji bo çeyî û rîndiya ziman, çand, edebiyata kurdî û insaniyetê he. Ji ber vê yekê jî hemû grûb û komên kurdî dostê min in. Çeyiya wan her daxwaza min e. Ez hebûn û pêşketina wan mîna pêşketina gelê kurd dibînim.

Herçî “universalîzm” e, ez ji demeke dirêj e, li derveyî welêt, di nav ziman û çandên cihê de dijîm. Pêwendiyê min bi ziman û edebiyatê cihê re hene. Gelek nivîskarên ku ji ziman, welat, çand û dîtinê cihê tê, heval û dostê min in. Ez bi van pêwendiyan gelek kêfxweş im, ji ber ku ew gelek tiştên nû hînî min dikin û alîkarî li min dikin ku ez bikaribim di nivîskariya

xwe de “pencereyên nû” ve-kim. Universalîzm ji bo min, pêwendiyâ ziman, çand, edebiyat û adetên cihê ne; nêzîkî li cîhanê kirin e; cîhanê ber bi xwe rakêşandin e; insaniyet e, perçeyekî insaniyetê bûyin e. Par, min ceribandinek, bi navê Welatê Xerîbiyê nivisi. Li wir, ez hinekî behsa pirsa we jî dikim û dibejim: “Hevvûdunasîna ziman û çandên cuda û dan û standina tecrubê û insanî yêñ adet û ûsilên cuda dikare bibe se-bebê guherînin bi heyecan û hêja û bibe kahniya avahî û afîrinê dewlemed... Ez wi-san bawer im ku dîtin, ideal, şêwe û tevgerên nû, pirî caran, ji koçen mezin nasîna ziman û çandên nû, dîjîtiyê çandî û civakî, tevliheviya ruhî û civakî û guherînen mezin tê pê... Ev berpirsi-yarı, bîr û hîsîn navneteweyî ku ji guherîn, afîrandin, nasîn û têkiliya çandî dizên, di eyî wextê de, bingehê şêweyên jiyîn û fîkrînen demokratik, insanî û rengîn e.”

— Tu dikarî hinekî behsa xebatê xwe yêñ nû bikî?

— Ji demeke dirêj e ku ez li ser romanekê dixebeitim; Bîra Qederê. Ez û romanê rabûne hev, her roj şer û pevcûna me ye. Ez pir dil dikim ku di vî şerê dijwar de bi ser kevim. Ü heta ez bi ser nekevim, tu rehetî jî, ji bo min nîn e. Lê biserkerîn jî hê dûr e... Digel vê xebatê, hin xebatê din jî hene, lê ez naxwazim serê we bi wan bişînim. Jix-we gava ew derkevin, hûn ê wan bikinîn...

Tevî spasen xwe, ez biserkerîn û serfiraziya we, ji dil, dixwazim. Hûn bijîn. □

*Heyveyîn: Nesimi Aday*

# CINDÊN ŞÊX SEÎD

Gernas û egîtên misliman, wekî şêr in  
Ji mirinê natirsin, mîrxas in, mîr in  
Xwedaperist in, dînnas in, wekî Eliyê Şêr in  
Rast in, camêr in, wekî durr û sedef û zêr in

Rêhevalên xwe re nerm in, wekî hevîr û şîr  
Dijminên xwe û Xweda re, hişk in wekî kevir  
Diçin ser hêzên Xwedanenas wekî rim û tîr  
Li ser serê wan dîbin wekî Munker Nekîr

Ji kuştinê natirsin, mirin ji wan direve  
Qêrîna Ellah Ellah dijmin paş ve direve  
Ala wan dînbetalan serjêr erdê dikeve  
Birînên mucahidan bi serkevtin dikewe

Ey alema cihanê, hun dizanin em kî nin  
Em cindên Şêx Seîd in, gorîyêng cenga dîn in  
Gorîyêng dînê heqq in, yê ku jiyan vejîn in  
Hun bizanin gellê cihan, ka em kî nin em kî nin

Em in roja cihanê, me dîrok ronî kirye  
Me serê botperistan, b'şûrê tewhîd jêkirye  
Sazûmana Xwedayî, me bi xwîn ava kirye  
Agirê azadiyê, hetta ezman hilkirye

Dîsa cihan wêran bûye yê ku avakin em in  
Gellê cihan bindest bûne, yê ku azadkin em in  
Ber cenga azadiyê de xwîna me weke çem in  
Em Zeyneb û Huseyn û Hemze yêng hemdem in

M. Şakir Koçer

# GAZIN

Hey xuşk û biran  
Heval hogiran  
Ji bo Şerîet  
Xew nexin çavan

Belê Şerîet  
Dixwaze xîret  
Bi dev niştiman  
Çenabe ti qet

Hemû çav vekin  
Jêhat û şek bin  
Li ser lingêng xwe  
Bi hev biseknin

Yekitî xweş e  
Cejn û şoreş e  
Ji hev qutbûyîn  
Zilm û şevrêş e

Ji can û dil ve  
Bi ser û ber ve  
Nevîna nav xwe  
Bavêjin derive

Tev destbira bin  
Bi hev re rabin  
Şerîet bînin  
Kêfxweş û şabin

Abdullah Aydin

# SEMPOZYOMA NÜBIHAR:

## “PIRSA KURDÎ ÇAWA ÇARESER DIBE?”

Felat Dilges

**D**i roja 16.5.-1993'an de li Stenbolê ji alî kovara Nûbiharê ve sempozyomê bi navê "Pirsa Kurdî çawa çareser dibe?" hat çêkîrin. Di sempozyomê de ji der û dorêن cûr bi cûr gelek ronakbîr û siyasetvanêن Kurd û Tirk besdar bûn. Sempozyom di hawayek gelek demokratik û xweş de derbas bû. Tarik Ziya Ekinci, Hikmet Ozdemir, Mehmet Metiner, Yilmaz Çamlibel, Sabah Kara, Altan Tan û Husnu Okçuoğlu di sempozyomê de teblîx pêşkeş kirin.

Di beşê duwemîn ê sempozyomê de, ji muzakerevanan Abdurrahman Aslan, Abdurrahman Durre, Ahmet Taşgetiren, Ahmet Zeki Okçuoğlu, Ali Bulaç, Asaf Savaş Akat, Atasoy Muftuoğlu, Erçan Kanar, Feqi Huseyin Sagınç, Hasip Kaplan, Ismail Goldaş, Mehmet Pamak, Osman Aytar, Osman Tunç, Ramazan Deger, Şefik Beyar, Felat Dilges û Nilüfer Gole û çend ronakbîrên din peyivin.

Ji teblîxvanan Tarik Ziya Ekinci di axaftina xwe de bi pirranî li ser pirsa demokra-

siyê sekinî û ewha got: "Pirsa netewî û demokratik a gelê Kurd li Tirkîyê temînata demokrasiyê ye. Tevgera demokrasiyê ya Tirkîyê, ji bo ku li Tirkîyê demokrasiyê ava bike, divê ku berî her tişî çareserkirina pirsa Kurdî ji xwe re bike prensîb. Demokrasî peyvek statîk nîne; ew pêvajoyek dînamîk e. Ew di riya pêşveçûna mirov û azadbûna kedê de pêvajoyek e. Li gor min li Tirkîyê demokrasî tune; azadiya ramanî û hawerî tune. Tişte ku rejîmê beyan dike mîlîtarîzm e. Tirkîye dewletek huquqî nîne, ew dewletek qanûnî ye." Tarik Ziya Ekinci axaftina xwe bi vî awayî temam kir: "Li Tirkîyê gelê Kurd heye, tekoşîna netewî û demokratik a vî gelî heye."

Di pey Tarik Ziya Ekinci de Dr. Hikmet Ozdemir peyi-vî. Hikmet Ozdemir bi çend tesbîten sosyolojîk dest bi axaftina xwe kir. H. Ozdemir di axaftina xwe de ewha got: "Ji bo ku mesele bê fêmkirin divê ku sê nuqte bên beyankirin. Yek, çewtiyên dewletê; du, çewtiyên yên ku li ser navê Kurdish ketine rê; sê, tesbîtkirina rastiya sosyolojîk." H. Ozdemir di axaftina xwe

de beyan kir ku daxwazêñ federasyon an serxwebûnê ne rast in; lewra li Tirkîyê du civat tunin; civatek heye. H. Ozdemir ewha got: "Civatêñ Kurd û Tirk tunin. Dema ku hûn federasyonê biparêzin, divê ku hûn odayêñ mirovan ên razanê ji hevdû biqetînin. Heke iro nifûsa Kurdish bi pirranî koç nekiribûya rojava, wê gavê belkî mirov bikaribûya ji otonomiyê qal bikira. Yêñ ku li cografya Tirkîyê dijîn ketine nav hevdû; bi hev re keliyane." H. Ozdemir di axaftina xwe de beyan kir ku pirs ne di navbera Kurd û Tirkan de ye. Çareseriya pirse bi dewletê re ye.

Ji teblîxvanan Mehmet Metiner li ser rewşa dîrokî ya pirsa Kurdî sekinî û di peyi-vîna xwe de beyan kir ku ev pirs pirseke herêmî û kevn e. M. Metiner di axaftina xwe de got ku federasyon wekî riyeke çareseriyê dê ji alî dewletêñ Tirkîyê, İran, İraqê û Suriyê ve neyê pejirandin; lewra ev dewlet dewletêñ netewî ne. M. Metiner di axaftina xwe de ewha got: "İmparatoriya Osmanî ji bo ku bêtir bac û bêtir leşker ji Kurdish bisîne berê xwe da Kurdis-

tanê û ji serhildanê Kurdan re bû sebeb. Di dema "Cumhuriyet"ê de jî mantiqa 'tune bihesibîne û bipelçiqîne' hat pejirandin. Ji damezirandina Komara Tirkiyê heta niha politikaya "reddî mîras" tê emilandin. Çareseriya pirsa Kur-

cîhanê de sê bûyerên dîrokî hene: 1) Şoreşa İslâmê ya 622'an, 2) Şoreşa Fransiz a 1789'an, 3) Şoreşa Sovyetê ya 1917'an. Em yên çepgir (solcu) Şoreşa Sovyetê fîr dibin; lê di derheqê Şoreşa İslâmê de çi dizanîn? Mihe-

neguhartiye. Xwedê İslâmê di nav 23 salan de aniye."


Sabah Kara di axaftina xwe de li ser paşdemayibûna rewşa kulturî ya gelê Kurd sekinî û ewha got: "Rewşa kulturî ya Kurdan pirr li paş maye. Kurd ne amadene ku bi nevdu re tevger bikin û yekitiyan pêk bînin. Di rewsek ewha de dewlet nayê avakirin. Bi tenê bi nêrîna İslâmî jî çareserî pêk nayê."

Sabah Kara li ser wezifeyen ronakbîriyê jî sekinî û ewha got: "Ronakbîr ne yê zana ya, yê ku dipirse ew ronakbîr e."

Piştî Sabah Kara ji tevlîxvanan Husnu Okçuoğlu peyi-vî. Husnu Okçuoğlu di axaftina xwe de li ser pirralîbûna pirsa Kurdi sekinî û di axaftina xwe de beyan kir ku zêde neheqî li ronakbîren Kurd tê kirin; lewra xwedîyê çareseriya pirsê ew nînin.

Husnu Okçuoğlu di axaftina xwe de ewha got: "Ez pêvajoyê ji çareserîyê girîngitir dibînim. Ez ne di vê baweriyê de me ku ronakbîren Kurd xwedî pêşniyarkirina çareserîyek esasî ne. Ronakbîren Kurdan hergav bedel dane. Divê ew bêñ gohdarîkirin. Di çareseriya pirsê de çar dijwariyên girîng hene: 1) Parvebûna Kurda a dîrokî 2) Bi derengîketina çareseriya pirsa Kurdi 3) Li Tirkiyê nebûna demokrasiyê 4) Belavbûna nufûsê ya cografi."

H. Okçuoğlu di axaftina xwe de beyan kir ku divê nêrîna dewletê û nêrîna tekoşîna çekdarî biguhure û Kurd besdarî pêvajoya demokratîk bibin. Husnu Okçuoğlu di pey de ewha got: "Niha nakeve ser me ku em bersîva Kurd ci



dî ewqas ne dijwar e. Divê mafêñ netewî yên gelê Kurd bêñ pejirandin. Daxwaza dewleta netewî çareserî nîne. Ev pirs di çarçiva dewleta unîter de dikare bê çareserîrin. Li Tirkiyê hê mana ku gelan digihîne hevdu İslâm e. Divê Kurd vê rastiyê bîbinin. Dema ku welatparêzen Kurd bi İslâmê re li hevdu bêñ, dê çareseriya vê pirsê hêsan bibe."

Ji teblîxvanan Yılmaz Çamlıbel li ser girîngiya nas-kirina civata ku em tê de dijîn sekinî. Yılmaz Çamlıbel di axaftina xwe de beyan kir ku di civata em tê de dijîn de gel hene, dîn hene û mezhebêñ cûr bi cûr hene. Y. Çamlıbel di axaftina xwe de ewha got: "Di çareseriya pirsê civakî de metodêñ îlmî pêwîst in. Divê ku em objektîf bin. Di

med bi sazûmana koledariyê feodalîzmê hilweşand." Yilmaz Çamlıbel di axaftina xwe de beyan kir ku çareseriya pirsa Kurdi girêdayî lihevkirina netewî ye û divê em ji hevdu fêm bikin; riya diyalogê pêşvetir bibin.

Di pey Yılmaz Çamlıbel de Berpirsiyare Giştî yê Kovara Nûbiharê Sabah Kara peyi-vî. Sabah Kara bi awayekî giştî li ser nêrinîn cûr bi cûr sekinî û di axaftina xwe de rexne li mantiqa "an bi tevayî an qet" girt. Sabah Kara ewha got: "Di nav Kurdan de yên ku statukoyê diparêzin hene. Musilmanêñ ku van nêrînan dipejirinîn hene. Pirs ne bi tenê pirsa Kulturî ye; mantiqa "an bi tevayî an qet" neçareserîyê bi xwe re tîne. Xwedê bi xwe jî civatê bi mantiqa "an bi tevayî an qet"

dixwazîn bidin. Divê bi hevdu re mayin an ji hevdu qetandin bi awayekî demokratîk bibe. Nêrînek nû ya li ser li hevdûkirina çivakî pêwîst e. Divê ev li ser bingeha ideolojiya netewekê nebe."

Di pey de ji teblîxvanan Altan Tan dest bi axaftina xwe kir. Altan Tan li ser

rewşa dîrokî ya Rojhilatana-vîn û avabûna dewletên mezin sekinî. Altan Tan di peyivîna xwe de ewha got: "Di Rojhilatana-vîn de, di dîrokê de misêwa împaratoriyyê mezin hebûn. 3-4 hezar sal e ku li Rojhilatana-vîn organîzasyonê mezin hene. Dîsa li Rojhilatana-vîn û Qafkasan fonksiyona beyankar, faqora dîn e. Şerîn gelan bi hevdu re tune, sedemê şeran berjewendiyê xanedanan e. Sebebek şeran jî dîn e. Sebebek din jî pêkanînê mezhebî ne. Li Rojhilatana-vîn û li Balqanan entegrasyonek etnîk heye. Di paşeroja Rojhilatana-vîn de nêrînê netewperest û etnîkî tunin. Pirsâ Kurdi bi metodê ku ji derive têñ îthalkirin çareser nabe. Ev problem bi nêrîna dewleta netewî, derketin."

Altan Tan di peyivîna xwe de rexne li nêrîna dewleta netewî girt û ji bo Rojhilatana-vîn modelek dewletê yê nû parast. Altan Tan ewha got: "Divê em nêrîna dewleta netewî deynin aliye. Divê sîsistema eyaletê bê danîn. Zago-



nek bingehîn a nû bê bisazkîrin. Li vî welatî şerê gel û dewletê heye. Divê ku ronak-bîrêni Kurd bi İslâmî re li hevben."

Di beşê duwemîn ê sompozyomê de muzakerevanan dîtinê xwe anîn ziman û bi pirranî li ser teblîxên ku hatibûn pêşkeşkirin munaqeşe çebûn. Ji muzakerevanan Ahmet Zeki Okçuoğlu got ku bila İslâm bi Kurdan re li hevdu bê, ne ku Kurd bi İslâmî re li hevdû bê. Dîrokzan İslâmî Goldaş, di çareserkirina pirsâ Kurdi li ser zîhniyeta mirovî sekinî û ewha got: "Otorîta desthilatdar di pirsâ Kurdi de zihniyetekê afirandîye. Ew zihniyet Tirkbûna Kurd e."

Ji muzakerevanan Osman Aytar jî di axaftina xwe de rexne li dîtinê ku dewletbûna Kurdan naxwazin, girt, bi hin mîsalan durûtiya hin polîtikayê şovenîst û statuko-perestan anî ziman û got: "Di nav sînorêni TC'ê de du mesleyen Kurdi hene: Yek, mîsela Kurdîn Kurdistanî ye, ya din jî mîsela Kurdîn ku li Tirkîye dimînin e." Osman

Aytar, li ser pirsâ mafê çarenûsiya gelê Kurd jî sekinî û ewha got: "Di çareserkirina pirsê de hemû kes pêşniyariyê xwe dibêje, lê kes guhê xwe nade dengê gelê Kurd û napirse ka ev gel çi dixwaze. Divê neyê ji-bîrkirin ku dê biryara herî

rast û herî dawî ji alî gelê Kurd ve bê dayin."

Felat Dilgeş li ser rewşa parvebûna gelê Kurd û Kurdistanê rawest û di axaftina xwe de ewha got: "Hemû kes ji yekîtiya Kurd û Tirkan; Kurd û Faris û Kurd û Ereban qal dike; lê kes li ser yekîtiya gelê Kurd û parvebûna Kurdistanê nasekine; vê rewşa parvebûnê ji bo Kurdan wekî qeder tê dîtin. Pirs ne pirsâ Kurdi ye; pirs pirsâ Kurdistanê ye. Hevalîn Musilman li dijî dewleta netewî ya gelê Kurd derdikevin û sazûmana Ummetî diparêzin; lê em ji agahdariyê xwe yên dîrokî û tecrûha Împaratoriya Osmanî dizanin ku Ummetî jî pirsâ Kurdi re tu çareseriye kîneaniye. Ez vê nêrîna hevalîn musilman bi vî awayî taswîr dikim: Di nav Kurdan de hes-ta avakirina dewleta Kurdi pêş ve çûye û iro Kurd di vî warî de gavên girîng davêjin; yanê Kurdan kevçiyê xwarinê birine ber devê xwe, birayêن musilman dibêjin: 'Eman êdî kes xwarinê bi devê xwe naxwe, kevçî bibin pozê xwe.' □

# XİZMETÊN GIRANBIHA YÊN KU KURD JI UMMETA ISLAMÊ RE KIRINE

Dr. Fehmî Şinnawî

**D**i dîroka Islamê de Selaheddîn Eyyûbî, Ibnu'l Esîr, Ibn-î Xelkan, Ibn-î Teymiye, Bedîuzeman Seîdê Norsî; hinek ji şexsiyeten Kurd yên muhîm in. Kurd hew ne şervan in. Ji navbera wan, gellek rewşenbîr, siyasetvan, feylesof, dîrokvan, muheddîs û feqîh jî derketine.

Di cengan de rola Kurdan, hew bi serketina Selaheddîn ya bi xaçiy'an re ne mehdûd e. Wextê ku Kurdan digel Selaheddîn, bi xaçiy'an re herb dikir, Ereb ji herbê vekişyan û weke adeta xwe yî her car, bi xaçiy'an re hevkarî jî danîn. Rola Kurdan, ne mahdûdê serfiraziyên Selahhedîn e yê ku ji nav Kurdan derketiye. Ewan di hemû futuhatê Islamê de cih girtine: Ji rojhîlata Hindê ta bi rojavaya Ewrûpa Navîn. Ewana her û her şervanên sefîn ewil in û mirovîn ji mirinê bêtirs in.

Ewana fatihêن Qefqasya bûn; zorbîrê Çîn û Rûs û Moxol in. Di seranserê dîroka wan de bi dijmin re aşitîyêk bi zîllet nekirine û bi caşîtiyê nelewîsfîne. Ti carî alîkariya xwe ya islamê newaşartine û pê súcdar nebûne. Ji bona xwe meqamê sermiyantiyê û menfaetên ku pê re têن, seray û sefîrtî nexwestine. Di jiya-

## PORTRE

Dr. FEHMÎ ŞINNAWÎ:

Nivîskarê Misrî. Di sala 1917 an de li Misrê hâte dinê. Tehsîla pezeşkî (tib) û li Ewrûpayê îhtîsasa Mîzuyî (Bewliye) temam kir. Ji ber fîkr û ramanêñ xwe gellek cara ji aliye hukûmeta Misrê hate girtin û kete girtîgehê. Ji bil vê, beriya wefata Xumeynî çima ku di nava tebîbêñ Xumeynî de bû ji aliye Dadgeha Parastina Dewletê ya Misrê hate darazdin.

Ev sî sal e ku di curbecur kovar û rojnameyên Erebî de dinivîse.

na xwe de tenezulî çaplûsiyê û zîlletê nekirine.

Welatê xwe bi navê 'Kurdistan' navdar kirine. Nivîskarê Rojava, bi navê 'Welatê qehremanan' vî herêmî navdar dîkin. Heger ku em jî bêne însafê, divê ku em jê re bibêjin "Welatê şehîdan." Di pêvajoya dîrokê de bûne şehîdîn islamê.

Beriya mîladê bi 5000 sal û vir de li Rojhîlata Navîn ji yana xwe didomînin. Di dema Hz. Omer b. Xettab de islamiyetê qebûl kirine. (Di nav mîletên misilman de, piştî Ereban, Kurdan islamiyet qebûl kirine- H.A.) Arînjad in, zimanê wan Kurdî ye. Ev ziman, ji bil Kurdên Tirkîyê, bi tîpêñ Erebî tête nivîsandin.

Lewra qanûnê Cumhuriyeta Tirkî wan mecbûrî tîpê latînî kiriye.

Rûpişa Kurdistanê 500. 000. km<sup>2</sup> ye. Nifûsa wan li gor hejmara 1984 a, 22 000 000 e. Mazlûm in û sunnî ne. Gişî wan jî evîndarên şehadetê ne. Ew di dijraberîya nezaniya hemdemî de, hêza berxwedana ummeta islamê ne. Ji dema ku li Kurdistanê keştiya Hz. Nûh li ser ciyayê Cûdî rûnişt û di rêberiya Hz. Nûh de pêşdarêñ mirovantiyê yên mu'min dahatin û vir de, Cûdî meskenê Kurdêñ pêşdarêñ îmanê ye.(\*)

*Werger: Hayrullah Acar*

(\*) Ji pirtûka Islam Ummetinin Yetimleri Kurtler

# REWŞA NUH Ü XORTÊN ME

Aqil Mihacir

**X**ortên Kurd, aniha di dewreke xirab de ne. Ma wê çima ne wisa bin? Ne ders û şîretek ji dê û bavê xwe û ji civaka ku di nav de ne bihîstine û ne jî rêzan û rêberê wan rêkek xweş li ber wan vekirine.

Çiqas toximê xirabiyê û nerindiyê hebûn, di dewra van xortên me yên bêsiûd de dane der. Bedena wan li hember van tiştan ne zexim (qewî) bû û dilê wan jî ne ewqas bi curhet û hêvî bû. Ji hêla çêbûn û zanebûnê û qenciyê de siûda wan tinehû.

Xortên ku em li hêvî mabûn, di vî halî de bûn: Wexta ku bi xwe hisiyan, wexta ku çavêن xwe vekirin, dîtin ku hinek (qaşoka! mezinin û rêzanîn), ji xwe û ji wan dirvin. Dîtin ku, hinek di şopa rêwenda û xirabxulqan dimeşin. Û dîtin ku hinekî din jî, dîkin ku bi navê xelasiyê wan bikişînin û têxin çehlan û bîran.

Gelo gelê me di nav ewqas rêkên xirab de wê çawa rêka rast bîhîne? Wê çawa di nav vê toz û dûmanê de bêhna Muhemedî (s), bêhn bike?

Heger ev hal û rewş hate famkirin, em ê karibin derbasî bersiva ku li hember pirsa

"Xelasî û şiyarbûna xortên me, di vî halî de wê çawa be?" ye.

Beriya gişî, ev xortê ku ewqas ji xwe dûr ketine, lazime ku em şexsiyeta wan bi wan bidin naskirin. Lazime ku em rêka zanebûnê rayê wan bidin. Em zanin ku, rêka fikirandinê wenda kirine. Gereke em rêka fikirandin û têkoşîn û meşandina li ser şopa dozê, raberê wan bikin. Divêt em bidin famkirin ku, dîroka wan û gelê wan, xerabî li dera hanê, gişî bi şan û şeref e, bi qencî û xêrxwazî ye.

Heger niha mij û dûmana rênezanhûn û rêwendayî û neqencîtiyê, girtibe ser gelê me, ne rast e ku em ji wan bixeyidin û biqehirin. Lewra xeletî û kemasî di me hemûyan de heye.

Tu yê bêjî çima?

Hey lo, dilê min bi heyran! Wexta ku gelê me bi qîrîn gazî dikir û digot: "EZ fetisim ji vê dûmana bêşretiyê û bêexlaqiyê", ma em çûn hawara wî? Wexta ku nalenal bi ser birîndarê îmanê ket, ki jê re ava nûranî kişand? Haho û hawar, ha mîna niha tê bîra min; çawa ew xortên me yên nezan û bêguneh di rêka ji-yana (ku tije çehlê xerabiyê û bêimaniyê bûn) mezinhûnê

de dipelikîn? Çawa gundorî çehlan û bîran û kendalan di'bûn? Çawa pêtiyên agirê bêimaniyê diavêt nav dil û imana wan?

Di dêvila şewitandina qelb û imana wan ve, ji do de razîme ku bila qe desten wan bihata şikandin û li şûna dûrketina ji xwe, ez razîbûm ku, bila li dûrê ewlad û bavê xwe biketana. Lewra, wê çaxê şiyarbûna me, bixwehesiyabûna me, wê hê zûtir bibaya.

Ya rast ew e ku, heta niha tiştekî rastî û Muhemedî (s) bi heqî me ne da gelê xwe. Wexta ku hawar ji me xwestin, em neçûn hawara wan. Heger ku me dest û lepêñ xwe dirêjî wan kiribaya, şro ev rewşa hanê ne dihat holê.

Pirtûkê ku têne xwendin, me qet nedan wan. Bêhna Muhemedî (s), me bi heqî neda bêhnikirin. Reng û boyaxa bav û kalan, me bi wan neda naskirin. Rêya ku diçû ser gola qenciyê û rizaya Xweda, me pêşî nekir. Xort û gelên me jî loma ketin vî halî.

Ê ez ji we rica û lava dikim, ci heqê me heye ku em xêrxwazî û serbilindiyê û şopajotina bav û kalan û heqaniyetê, ji van xortan em karin bixwazin? Di nav me de çend kes hebûn ku destê xwe dirêjî

van xortan dikirin; rica min li we?

Gelo çend heb hebûn ku ji bona razîkirina Xweda, ji bona ku wan ji kufrê xelas bikin, destê xelasiyê dirêjî wan dikirin?

Ma me qala xortên mîrxas û qehremanên wan, li cem wan kir ku xwe nasbikin? Qet me rêzanek karîbû derxînin pêş çavêwan, ku dibêje: "Hetanî Qudûs di bindestê kufrê de be, bila ken û razana cihê nerm li min heram û qedexe be."

Ti me, ew mîrxasê bê tîrs û herhêvîdar, pê da naskirin ku, digot: "Belê, hêvîdar bin! Di nav van şoreşen pêşerojê de dengê tewrê bilind, wê dengê İslâmê be."

Hetanî niha sed şefeqê rewîn li me dan der. Ev bi sedan sal in ku çavê me li rîkan dinerin. Kanê kengî em ê "Te-la'el bedrû aleyna" bibêjin. Kanê em ê kengî dengê Hemze û Selaheddîn bi hevre bibîhsin?

Ê lê ji vir û wa?

Ji Xwedayê Mezin re şikr û spasî be. Şiyarbûnek ketiye nav gel, bi taybetî jî nav xorten me ku em bawer dîkin ku melekan li azman temaşa wana dîkin û bi hevre mîzgîn didin.

Yênu ku vê şiyarbûnê tehemmul nekin jî wê hebin. Li hember dek, dolab, los û xirabiyêwan, lazime ku xorten me, bibin çilekêş di rîka Xweda de.

Ji bo ku xorten me werin vî halî divêt menfaeta xwe ya şexsî biterikînin. Gereke ku ji ken û kîfî dest bibirrin. Divêt digerxem û hemheval bin. Û xebatkarê gel û ometa Muhemed (SXL) bin... □

# Jİ SEÎDÊ NORSÎ RE

Nav dîwarên kevirîn de, merivekî çilekêş Wexta hatibû gotin, çerxa xewrojkan borî Hember hemû cûr şirkan, şervanekî gavêne pêş Wê tîr bîghê mebestê, ema şoreş hildorî

Anatolya nalevan, dengê xwe d'wî de didî Mêjiyê masonan de fişeng e, her peyvên wî Mîrxasiya di wî de, ji rihê Eliyan têt Ew niha jî dijîne, li her der û her alî

Ma sibe ne nêzîk e? tavê helbet wê bizê Tevgera Mehdiyetê, tîrsa girtira kufrê Dema hakim be l'erdê, wê çerx, ya tewhîdê be Nav hesretan de bila, her kes bêhnkê bihiştê

Çirayek û hêvî ye, her dem di nava gel de Zanyar-mezinê çerxê, her dijî d'qelbê me de Neslîn ciwanên gîhan, wê bi meşî d'şopa Wî Xwediyyê vê dozê wê her dem razî bit ji te

Dinya di nav "raz"an de, pirsolekek çetrefîl Hemû gerdûn-heyinan, bêdeng bêdeng diherik Li ezmanan stêrkan, dibêjîtin du peyvik Yê diciitin bêdawê li afaqan dinêhrin

Kütahiyek wê hebe, di gerdûna bêdaw de Wê hinekan derkevin, nenasên mûcîdên xwîn Yê rûdinin li bîvê, vê sefera jiyan de Gelo ev "rastî çiye?" wê hîn gellek bişuxlîn

## Ekrem Sêwasî

# MELE EHMEDÊ BATEYÎ

Zeynelabidîn Zinar

**Y**ek ji nivîskar û helbestvanêن Kurd ên kevna-re, Mele Ehmedê Bateyî ye. Li gorî gotinan, navê wî yê asasî Mele Hiseyn e. Lê me nezanî ku ka çima bi navê Ehmed hatiye navdarkirin.

Mele Ehmed, bi gundê xwe yê Batê hatiye navdarkirin. Lewra ku jê re tê gotin Mele Ehmedê Batê (Yan jî: Bateyî).

Pr. Qanadê Kurdo nivîsiye, ku A. Jaba gotiye û herweha Mîr Celadet Elî Bedirxan jî di *Ha-warê de wisa nivîsiye* ku: Mele Ehmedê Bateyî di sala 1417 an de li gundê Batê ji diya xwe bûye û di sala 1491 û de jî çûye dilovaniya xwe.

Lê kovara *Hêviya Welêt* (r: 65) nivîsiye ku Melê Batê di sala 1465 an de çûye dilovaniya xwe.

Ü nivîskarê bi nav û deng M. Emin Zeki Beg jî, di *Tarîxa Kurdistan* de nivîsiye ku: Melê Batê di nav salên 1417-1495 an de jiye û ji Batêya grêdayê bi Hekariyê ve ye. Navê wî yê rastî Ehmed e, Dîwan û Mewlûdeka wî, du pirtûk hene. Mewlîda wî, A. Von Le Coq (1903 - Berlin) û piştre di sala 1906 an de li Misrê Kurdi-

zade Ehmed Ramizê Licî çap kirine (*Tarîxa Kurdistan*, weşanxane ya Komal, Temûz 1977, rûpel:181 - bi zimanê Tirkî)


Melê Batê, bi esl û koka xwe, ji eşîra Ertûşîyan e. Ew Eşîr, di navbera Hekarî û Wanê de cîgir e. Lê gundekî din jî bi navê "Batê" li hêla

re pirtûk û helbest nivîsîne. Pirtûka wî ya herî bi nav û deng, ku her kes dinase *Mewlûda Kurmancî* ye. Belê tê gotin, ku diwanekî wî jî heye. Her çiqas ku ew dîwan iro li holê nayê dîstin jî, lê gelek helbesten wî hene û bi zargotinî têne gotin û di nav xelkê de digerrin.

Gelo wê ew helbest ji dîwana ku dibêjin bin, yan wê yên derveyê wê bin? Lê dibe ku ew dîwan, berî ku bi pirtûkî derkeve, ji hevde ketibe û helbesten wê teko teko belavbûbin.

Çawa ku me li jor got, berhemâ Mele Ehmedê Bateyî ya herî bi nav û deng, diyar e ku *Mewlûda Kurmancî* ye. Mewlûd heta niha pirr caran û li gelek deveran, di demêna cuda cuda de -bi tîpêن Erebî- li çapê ketiye. Lê cara pêşî, me wê ji tîpêن Erebî wergerande tîpêن Latêni û di sala 1987 an de, ji aliyê Roja Nû ve li bajarê Stockholmê hate capkirin. Ew çapa me ya bi tîpêن Latêni 19 beş, 582 beyt û 63 rûpel in.

Ev çar bend helbesten Batê ku me li jêr nivîsîne, di nav destnivîsarên herevokên me de derketin. Lê mixabin ji bo ku ew fotokopî bûn, li hin deveran nedihate xwendin. Ji



Midyadê heye. Ü hin kes dibêjin ku: Mele Ehmedê xwediyê *Mewlûda Kurmancî* ji vê Batê ye, ne ji Batêya Hekariyê ye.

Vî hozanê dilovan ê granbiha nêzî 500 salî berê, bi zimanê Kurdi (Kurmancî) ji me

ber wê yekê, me ew ciyên wisa niqut danîn.  
Hem jî, me wan beytan bi rewşa di nivîsara bi  
tipêñ Erebî de, bi Latêñ nivîsîn.

Belam, nikla xwendina van helbestan pirr  
xweş e. Hemû bi kêş û qafîye ne û rêz hemî bi  
kitejmar in. Di çend ciyan de, hin rêz bi zi-  
manê Erebî hene. Me wan bi nimre kir û di da-  
wiye de Kurmanciya wan nivîsî.

Çend qesîdeyêñ Mela Hiseynê Bateyî (r.l.):

#### BEND: 1

Ey ne'tê tu ez 'erşî heta ferşê şehîra  
Ey pertewê nûra te cehangeşta munîra  
Ey Seyyîdê alem bike perwayê esîra  
Ey tacê serê şahan û sultan û emîra  
Qed kane lekel fezlu lekel cûdû kesîra(1)  
Ursîlte îlel xelqî besîren we nezîra

Taha! tu resûlê Melikê 'erşê 'ezîm û  
Der behrê cemalê tu tenê durra yesîm û  
Lûlûsîfet û der sedefê behrê Kerîm û  
Ehsentir û ez Yûsifê siddîq ê helîm û  
Ma kane leken' nasu şebîhen we nezîra(2)  
Ursîlte îlel xelqî besîren we nezîra

Ey serwerê dîn, mehbetê ayatê mukerrem  
Îsmî te li hindî suhûfan bûye mufexxem  
Lutfâ te şeyatîn ji sema kirne mureccem  
Ger dê tu nebûya, nedibû çerxê mu'ezzem  
Tûba lî men eşfeqe lehû kunte mucîra(3)  
Ursîlte îlel xelqî besîren we nezîra

Ey le'lê lebet 'ezmî remîmî dikit ihyâ  
Coşan û xuroşan ji fîraqa te ne derya  
Ber şewqa ruyê tu bûye sergeşte Sureyya  
Herçî ku bi şer'a te 'emeldar e di dinya  
Kanet lehum-ul xuldu herîren we serîra (4)  
Ursîlte îlel xelqî besîren we nezîra

Fexra melekan padîşehê text ê Medînê  
Yek lehze giha erşê xeraman bi meşînê  
Neh çerxê felek bo te ne sergeşte evînê  
Xelkê ku neênit bi te îman û yeqînê  
Têk bûne xesaret we seyeslewne se'îra (5)  
Ursîlte îlel xelqî besîren we nezîra

Baranê selatan ji Xweda subh û 'eşîyya  
Ber Seyyîdê muxtar ê resûlê 'Erebiyya  
Ber al û we eshabê Hebîb ê Qereşîyya  
Siddîq û çi Farûq û çi 'Usman û Eliyya  
Kanû leke fid' dînî mu'înen we nesîra (6)  
Ursîlte îlel xelqî besîren we nezîra

Ey Seyîdê alem senedê nûra hîdayet  
Hêvî dikitin em ji te ey sedrê rîsalet  
Mehrûmî negêrî me ji dîwana şesa'et  
BATÊ bi cehennem ..... roja qiyamet  
Qed kunte lehu semme şeffî'en we zehîra (7)  
Ursîlte îlel xelqî besîren we nezîra

#### BEND: 2

El wefayî wesla canan xemzîdara min nehat  
Ya tu qelbê aşiqan û gulnîgara min nehat  
Mam di qeyda derd û daxan xemgusara min nehat  
Subhe nabit wê şevê dengê menara min nehat  
(...)

Derd û dax im, bê qerar im, bê bihar im, bê çemen  
Bê hebîb im, bê tebîb im, hem xerîb im bê weten  
Şubhê Yaqûbî ji işqa Yûsifê gulpirehen  
Mûnisê derd û xeman im sakinê beyt-ul hezen  
Tar û mar im, intîzar im, şehsiwara min nehat

Pertewa şem'a cemalî, min disojit dem bi dem  
İştiyaqa zulf û xalan têk kirim deryayê xem  
Dame ber pêça fîraqê, weslê qet nakit kerem  
Ma mededkarê me bit "Inna Fetehna" subh û dem  
Werne, sotim ateşê dil, şehriyara min nehat

Şuhemestan im weku dîwane ez dîwaneser  
Badenoş im, pîrxuroş im, bêyihoş im derbider  
Hesret û hierîn keser mehbûb û xeyrîn bîn'nezer  
Bil fîraqê lî'ittelâqî bê sikûn in ta seher  
Xwabê nûşîn ba ezîz im, dilnîgara min nehat

Meclisa bê saz û hey-hey, min nevêt naçimayê  
Bê def û bê çeng û bê ney, min nevêt naçimayê  
(...)

Bezmeya bê yara BATÊ min nevêt naçimayê  
Bê fîraxet yara BATÊ 'eşwekara min nehat

#### BEND: 3

Subh û êvarê şeva tarî şemala kê yî tu  
Leyletlqedr û Berat in nûra mala kê yî tu  
Çîçeka baxê Îrem şoxbejn û bala kê yî tu  
Bo Xwedê kî bêje min kanê şepala kê yî tu  
Dêm kitêb e, zulfî haşî, şerhê halê kê yî tu

Dîlbera gerdenşefîqî danuwa durr a Eden  
Nazik û mewzûnletîfi, nexliya selwa çemen  
Gullîbas û, gulqiyas û, gulenî, gulpirehen  
Ahuya deşta Tetarê, rehzena eska Xeten  
Horiya baxê bihiştê çavxezala kê yî tu

Qiblegeha aşiqan î, şengela ebrûzirav  
 Hate burca şanuşinê sed melayik çûn silav  
 Dax û kovana evînê sofî canê min tevav  
 Extera subha se'îd î, reşrihana tabelav  
 Fulfula Hindûsitânê zulf û xala kê yî tu

EW çi dêm e şahêbax e, gulşena dar-ul qerar  
 Sed hezaran nal û awazên (di) bulbul çarkenar  
 Helqe pê da best û hatin 'eqreb û ilan û mar  
 Nêrgiza şehlaşepal î, asimîna murxîzar  
 Lebxemûşê meyfiroşê dêmpeyala kê yî tu

Pencî salî, şehlewendê keftime çaha resed  
 Min nizanî çerxîdêm e tê heye burca esed  
 Çengelek avête dil kun kir li min, dad û meded  
 Qelbekî hişk û sefalîn min divêt can tê ebed  
 Şah li textê dîlberê fîkr û xiyala kê yî tu

Sefhe kêşa katibê xeybê ji nûra Layezal  
 Xalek e wa l'gerdenê mislî berê reş mah û sal  
 Sed hezaran rukbe hacî têna tewafa zulf û xal  
 Netrik û şetîr û ilan dane ber bayê şemal  
 Laubâlı çardexal î, çardesala kê yî tu

Şehkitêb e min divêt behsê mehebbet bît'teman  
 Sed tilism û sîhrî tê da pêkve Suryanî meqam  
 "Ebced" a işqê mi xwend û eqlî wenda kir û mam  
 Horîya baxê bihiştê tûtiya tawusxeram  
 Xeyrî BATÊ padışaha min delala kê yî tu

Rêza diduwan di her heft malikên bi zi-  
 manê Erebî, eynî ye. Bitenê me wê di cara  
 pêşî, mane kir.

1- Bêguman qencî û cwanmêri li nik te pir  
 heye. Tu, bi bal xelkê ve ji bo pêagahdarkirina  
 bi xweşî û tevgera bi ihtiyyat hatî hinartin.

2- Mîna te û di şûfê te de, hîç kes nebûne.

3- Peyva xweş ji wî kesî re be, ku te lê  
 şefqet û mikafatê kir.

4- Bû ji wan re di bihiştê de textê ji hevrî-  
 şim.

5- Tev bûn xisar û wê bigîjin alava êgir.

6- Bo te bûnê piştek û alîkar di dîn de.

7- Semme: Di zimanê Erebî de bi gelek  
 maneyan tê: Jehrî, li wir, baqek giya, piştre,  
 jar, û hwd. Lî Bateyî weha dibêje:

Da ku Batê nekeve dojeyê, tu (Yanî Mihe-  
 med Pêxember) jê re bibî piştek û mehdertiya  
 wî bikî.

(Ji kitêba Nimûne ji gencîneya çanda qe-  
 dexekirî)

# KA MISLIMANTIYA KU PÊXEMBER MUHEMMED PÊ HATIYE?

Mele Hemdî

**G**ellek mirov yan gellek komele  
 dibêjin "em misliman in", lêbelê  
 dixwazin mislimantiyê ji xwe re bi-  
 kin mortal.

Merema van mirovan yan jî komelan, eve  
 ku mislimantiyê li ber çava reş bikin û dijmi-  
 natıya mislimantiyê bikin. Weke ku niha bi  
 serê miletê me yê Kurd de tînin.

Heçî Kurdê ku bikeve navbera partieneke  
 misliman de, divê ku dijminatiya miletê xwe  
 bike, da hevalên wî jê bawer bikin û cih li  
 cem xwe bidênen. Lêbelê ew bi miletê xwe re  
 ne. Komunîst jî wisa ne.

Mislimentiya ku pêxember pê hatiye, ne  
 wisa ye. Şêxê me yên nezan xwest in ku milet  
 nezan bimîne da bikaribin weke pez wan bi-  
 doşin. Ola islamê eşkere ye û sivik e û rehet e  
 û girêk tê de nîne. Ew ji Qur'anê û ji gotin û  
 kiryar û pêrazîbûnên (ji sunnetâ) pêxember  
 e. Hîç ti qanûnan biqasî islamê mafê mirov ne-  
 dayiyê.

Vêca heger ew kesên biderewa bibêjin em  
 misliman in û li dûv islamê naçin, heger ko  
 wana bi navê islamê sitemê li mirov û miletan  
 dikin, ma gunehê ayin û ola islamê çiye?

Vêca em di vê nivîsarê de gazî hemû zana  
 û melayê Kurd dikin: Berê miletê xwe bidin is-  
 lama ku di Qur'an û hedîsan de ye, da di din-  
 yayê de serfiraz bin û miletê we jî serfiraz bi-  
 bin. Rê nedîn nezan û dijminê miletê xwe, da  
 ku nexapînin û sitemê lê nekin. Tenê bi vê  
 râyê em ê bikaribin ji dijmin û nezan û hêzan,  
 miletê xwe rizgar bikin û ol û ayinê wî bi-  
 parêzin.

# REWŞA KURMANCÎ Û ZAROKÊN KURD

M. Irşad Cûdî

**K**omara Tirkîyê (T.C) di mektebên xwe yê li Kurdistanê de nahêle zarokê Kurdan bi Kurdî bipeyivin. Axaftina zarakan bi zimanê xwe yê zikmakî qedexe ye. Hetta li bajar û gundine Kurdistanê, di mektebê de mamotoa ceza didin zarokê ku bi Kurdî bipeyivin. Her dem zarok di bin taqîbê de ne. Seydakî min digot: "Dema min mekteb dixwend nedihêliştin em bi Kurdî bipeyivin. Mamotoa digot: "Yê ku bi Kurdî bipeyivin, ez ê li wan bidim" û digot "Li malê jî bi Kurdî nepeyivin." Vêca li malê ez ditirsiyam, min digot: "Heger ez bi Kurdî bipeyivim bavê min wê giliyê min ji mamotoe re bikê û mamotoe jî wê li min bixe."

Dêhna xwe bidine vê rewşê; vicdanê insan jan didê. Kemalîstan di wextê Cumhûriyetê de Kurd bi zorê koçberî roava kirin û nehêliştin du malê Kurd li cem hev bin, ji bona ku bi hev re bi Kurdî nepeyivin û Kurda nedîwêriyan bêjin "Em Kurd in", nedîwêriyan bi Kurdî bipeyivin; çi ku dema bipeyiviyana ji wan re digotin "Kiro". Çerxa felekê ters fitilîbû li serê Kur-

da. Evan zilma, Kurd li hatina xweyî dinyayê poşman dikir. "Buwûna Kurd" bûbû bella li serê Kurda û hineke Kurd li ber van zilman tehemûl nekirin, ji bona rehetiya xwe, serê xwe li ber zaliman tewandin û mexlûb bûn û di talîyê de digotin "Xwezî ez ne Kurd bame" û ji Kurdbûna xwe fihêt dikirin. Hetta hinek ji van Kurdan ketin nav partî û grûbêne Tirk ên nijadperist û dest bi neteweperiya Tirkî kîrin. Lazime neyê jibîrkîrin ku derba mezin van insana li gelê Kurd dan. Meselen îro bi hezaran doza "Ulkucutiyê" dimeşenin, doza mihafezekirina rejîma Tirkî dimeşenin. Tu ji vana bipirsê "We çima zimanê xwe jibîr kiriye..?" wê bibêjin: "Doza me islam e, ko islam bû hakim, hemû tişt ê hel bibê...". Bersiva wan xweş e, lêbelê ew bi xwe ne li gora islamê ne; li dûv dînêecdadê xwe ne. Ez texmîn dikim, heger ecdadê van insana cihû bane, ji bona sehkirina ecdadê xwe, wê cihûtî qebûl kiribane.

Pirrên xwendevanên kurd yê ku di hinek pansionen mislimanan de ne, gerdenaza nikarin bi zimanê xwe bipeyivin. Salekê, duwê, sêyê, sala çara ev xortên Kurd bi te-

vahî pişavtinî (asîmîle) dibin, zimanê xwe jibîr dikin. Li gorra neteweperiya Tirkî evan zaroka perwerde dikin. Hinek ji van zaroka dema hişê wan tête serê wan û bi xwe dihisin ku Kurd in, dilê wan ji van mislimana jî sar dibe û ji islamê jî. Dest bi gera li navdanka xwe dikin, dimeyzênenin ku çepî, sosyalîst, û demoqrat li vê navdankê xwedî derdi-kevin, meyla wan diçe bal bi çepîtiyê ve, sosyalizm û demokrasiyê ve. Ev xortên Kurd ku mezin dibin, dest bi dijminatiya islamê dikin û dibêjin: "Islam mafê Kurda nadê wan, islamê Kurd li paş hêliştine..." Ev misliman bi şertê ku Kurd dev ji navdanka xwe û mafê xwe berdin, bira-tiya mislimanê Kurd qebûl dikin. Tu ji van re bêjê: "Hevalno! Ev zarok zimanê xwe jibîr dikin, asîmîle dibin, ev xort islamê nikarin ji gelê Kurd re bi Kurdî bêjin, yan bila kovareke islamîya Kurdî bixwênin da meyla wan neçê bi bal sosyalîstan û çepiyân ve..." Wê bersiva te bi yek cumlê bidin: "Kurdçîtiyê dikin!" Lêbelê aynî ev misliman her roj di rojname û kovarê xwe de behsa pişavtina (asîmîle) zarokê Tirk yê li Bulgaristan û Yunanistanê di-

kin. Eceba ev ne durûti ye, ev ne xayintî ye ku li islamê tête kirin.

Li gora van insanan "ko Kurd mafêñ xwe bixin destê xwe, koledar, Cihû û Ermenî wê Tirkîyê perçê bikin; ci ku Kurdêna dawa mafêñ xwe (yê hatin xespkirin) dikan, her tim têne leyiska koledar û Ermeniyan." Ma Cegerxwîn, Mûsa Anter û yê wek van, nebûne qurbanê vê rewşê. Van insanan lê nihêrin mislimanê Tirk, Ereb û Fars hebûna Kurdan qebûl nakin, wan red dikan, wana jî go: "Madem ev gelên misliman hebûna me qebûl nakin, naxwe islam jî mafê me nadê me." Û diketin davka marksîzmê. Pişt re dest bi dijminatiya islamê kirin, dest bi dijminatiya gelê Kurdê misliman kirin. Ji alîkî ve hatibûn xapandin, sebeb ku vana "Islam" ji jîna neteweperistên Tirk, Ereb û Farsa hasibandibûn, heqê wan hinekî hebû; ci ku qaide ye: "Yê hebûna min qebûl neke, ez jî ya wî qebûl nakim." Ev qaide iro jî derbasîbe. Heyfe ku islam ji destê ehlê xwe derketiye, ketiye destê yê ne ehil.

Ji bona ku Kurd zimanê xwe jibîr bikin û ji welatê xwe derkevin, dev ji cih û warê xwe berdin Komara Tirkîyê (T.C) Kurdistan ji refahê û inşaê mehrûm hiştîye. Meferen kar û palûke (febrîqe) hindik in. Seba vê rewşê gelê Kurd seqîr maye û digel vê, cahil e. Bi ser vê qasê de, ji bona ku Kurd koç bikin û Kurdistanbihêlin bi hêviya Tirk ve, heyrantiya hatina roavaya Tirkî kirine qelbê gelê Kurd de. Ji ber vê yekê gelê Kurd dibêjê: "Heger em herne Anadolê em ê xwe xilaskin." Û

têñ, lê Kurd nizanin ku dikevine xevka dijmin de. İro li İstanbul, Izmir û Bursa... bi hezara zarokê Kurda boyaxçitiyê dikan. Bi ser vê qasê de bi çavêñ xwar û ters li wan tê meyzandin, xor têne dîtin. Ev ji sed mînakî mînakekê min da.

Hey dinyayê! Bila zarokê xelkê di xwendegaha de bixwênin bi imkanê maddî yên xusûsî mezin bibin û paşê bibin mezinê me. Zarokê me jî bila di nav kolan û sûka de mezin bibin, nezan bimênin û pişt re jî bibin xulamê dijmin (xulamê xulama)!

Werin ji xwe re li hawîrdora Bursayê meyzênin, hun ê bêjin qey evder Şirnex e. Kolan (sikak) ê ku Kurd lê dijin toz û herî ne, pîrek nanê xwe li tenûrê dixin, şivistên wan li ber deryêñ wan nijinîne. Tê hê qey evder gundekî çiyê ye. Em bi vê rewşê naêşihin, tiştê em pê têşihin eve: Dê û bav bi zaroyêñ xwe re bi Kurdi naçeyivin, hetta hinek dibêjin "Lawo ko hun bi kurmancî biçeyivin, ez ê li we bidim." Ci ku li gor van pîrek û mîra, pêşveçûn bi peyivdana Tirkî ye. Xwe li Kurdi winda dikan, ji qest bi Kurdi naçeyivin. Ez ê mînakekê bidim: Diya min Tirkî nizane, cîranekê me heye kurmanc e lê Kurdi naçeyivê, vêca, wê roja ha bi diya min re bi Kurdi peyiviye û gotiye. "Xalet, di aslê xwe de ez bi Kurdi naçeyivim, lê ji bona xatirê te ez bi te re bi Kurdi peyivim." Ê malûm e zarokê li ber destê van insana mezin bibe wê bibê Tirk. Dê Kurd, keç Tirk; bav Kurd, kur Tirk. Hemû tişt tevîşhev dibe, dîbe şorbe. Piştî cil pêncih salî wextê bav û kalê ixtiyar jî

wefat kirin, berî wana zimanê Kurdi wê bikevê tîrbê. Ev rewş felaketa gelê Kurd e.

Ey Kurdê ku li nav Tirkâ (Anadolê) jîn dibin û roj bir roj xwe winda dikan! Çand, wêje û imana we tê talan kirin. Edî şiyar bin bes, ji pişavtinê re bibêjin na! Bi zarokê xwe re bi Kurdi biçeyivin û hun jî Kurdi qedexe nekin! Ma dijmin ne bes in, vêca hun jî dijminatiya xwe dikan? Dijminê xelkê din ji alîkî têñ, yên me ji her çar aliya ve hicûmî me dikan, seb ku em Kurd in û bi ser vê de em mislimanin, talûke li ser talûkê çedîbe. Kurdistî û islam li cem hev weke agir û benzîn e. Vêca wextê agir bi benzîn dikevê ziravê dijmin diqetînê.

Birano! Zincîrê koletiyê biçeqşînin û zimanê xwe azadkin.

Bijî azadiya islamiya gelan. Bijî zimanê Kurdi û Kurdistan!

Ez ê nameya xwe bi du helbesta temam bikim.

"Hela rabe serî rake eya bira  
Çi rojek bû li te, bi yeqînî hem bawer

Tu bizan kurmancî ye, xweş xeber e

Serî rakit li meydanê weke şêra"

Şêx Mûsayê Qiziltepî

"Yanî kurmancî eger ci ne şêrin e

Lakin di bin de mane êd şekirîn e

Gerçi ew barek, kêm beha ye Lakîn semerê wî şera Mustafa ye

Gerçi kurmanciya me ne fesîh e Fêhma mane ê ji wî xayet melîh e"

Şêx Yûsifê Bayezîdî □

# RÛPELEK JI EXLAQÊ

## PÊXEMBER

Ebdillah Amed

**H**ezretî Hesen kurê Îmamê Eli (Xwedê jê razî be) dibêje ku: "Min ji devê birê xwe Hiseyn bîhîst, digot: "Min ji bavê xwe, derheqê helwest û tevgerên runiştina Pêxember, ya li cem sehabeyên xwe çawa bû, pirs kir. Bavê min wilo bersîva min da:

"Resûlê Ekrêm (selam û rehmeta Xwedê li ser wî be), her timî rû bi ken û xwîxwêş bû. Şefqeta wî pîr û xwedî-bexş û borandin bû. Ne dîlişk û kevirdil bû. Bi dengekî bilind û berz ne diqîriya û gengeşî nedikir.

Wî, ti kesî eyibdar û şerpeze nedikir. Ew, ne çikos û pexîl bû. Tiştekî ku ne dieciband, wekî ku ne didît, jê rû vedigerand. Kesekî ji wî lave û merama tiştekî biker, ti cara wî destvala nedîşand û bê hêvî nedîhişt. Dema mijarek (mewzû) xweş nedidît, bê bersîv dihişt; diborand (derbas dikir) û

bêdeng disekeinî. Ji "sê tiştan" bi taybetî xwe di-parêzand.

1- Ji gengeşiyê (munazera).

2- Ji pîrr-peyivtinê.

3- Ji tişten ku wî elaqedar nedikir dûr dima.

Di nav gel (xelq) de, xwe ji "sê tiştan" dûr di-xist:



1- Ti xirabî û nerindiya kesî nedigot û ti kes jî xirabdar û şermezar dernedixist.

2- Li eyib û şermên ti kesî nedigeriya.

3- Tişten ku ji kesekî re bixêr û faydedar ba, jê re digot.

Guhdariyên Wî (Pêxember), mînakî çûçikek li serê

wan peya bûbe, bi wê dîqet û halakêşê, (ji bo ezberkirina gotinêñ Wî) bêdeng û miqatewî guhdarî dikirin.

Di dawiya axiftinêñ Wî de, gel dest bi peyivan dikirin. Di dîwan û hizûra Wî, sehabeyan, ti car bi gotinan gengeşî nedikirin. Dema yek, di dîwana Wî de bipeyiviya, hetanî dawiya peyvîn wî dihat, guhdarî dikir. Herwekê peyivdarê yekem, peyivîn mirovîn dumahî jî, li cem wî, wilo dihate guhdarîkirin. Derbara ku sehabeyan pê dikenîyan, Ew jî pê dikenîya. Derbara ku sehabeyan ecîb û sosret didît, Wî jî

ecîb didît. Biyaniyekî (xerîb) dihate cem Wî, bi gotin û pirsiyarên xwe tengîjî jî bidana Wî, dîsa jî tehmul dikir û bi aramkarî guhdarî dikir. (Heta sehabeyen Wî jî li biyaniyan wisânî muamele dikirin.) Qasidê Xwedê (Pêxemberê me) ferman dikir ku:

"Hun, dema mirovekî

xwedî-hewce dibînin ku daxwaziya tiştekî dike, arî karêن wî bin.”

Medh û sitayısa mirovekî ji hed derbas ne dikir û heger rast bûna qebûl dikir. Ti gotina kesekî ne dibirrî, lêhema di gotinêngotinvan de derbariyek dijê Şerîeta Yezdan hebana, midaxele dikir, an jî radibû ser linga (bi helwestên xwe dijîfî dikir.)

★ ★ ★

Bavê Telha (Xwedê jê razî be) xeber dide: “Min rojekî ji Resûlê Ekrem giliyê birçîtiyê kir û kincê xwe rakir, kevirêñ ji birçîbûnê me li ser zikê xwe girêdabûn nîşanî Wî da. Pêxemberê me (selam û rehmeta Xweda li ser Wî be) jî heman kincê xwe rakir û kevirêñ li ser zikê xwe girêdabû nîşanî me da. Me nêhirt ku, yên wî du lib in.

★ ★ ★

Jina Pêxemberê me, Hezretî Eyşe (Xwedê ji Wê razî be) fermondiye: “Resûlê Xwedê (S.X.L), hetanî ji vê dinyayê koç kir, du rojan li ser hev ji nanê cehîn têr nexwar. Tê rîwayet-kirin, dinya ji Xweda hatîye bexşandina Wî. Lêhema Pêxember xizanî hilbijartiyê û gotiye: “Bila rojekî ez birçî bimînim, da ku sebir bikim; bila rojekî têr bixwim da ku ez şikir (spas) bikim.” ferman kiriye.

(Ji Şemâıl-î Şerîfe ya Tirmizî, pirtuka hedîsan, rp. 180, 371) □

# ÇIRÇIRÎK Û MÊRÛ

Çirçirîk ta havînê  
Xilas be distirînê

Wextê dibê zivistan  
Li wê dibê taristan

Kurm û mêşa nabîne  
Gelek puşman dimîne

Ew diçê mala mîrû  
Dibê “Birçîme îrû

Hinik xwarin dixwazim  
Ko bû havîn dibazim

Cêhde tînim bi fayîz  
Nahêlim bighê payîz

Ger ne ez nebim kêzik  
Bêjin tu çiqa hîzik”

Mîrû çendî xweşmîr e  
Lê çavteng e newêr e

Dibê “Qusûrê nenêr  
Havîn demik wekî zêr

Gelo te çi dikira  
Evqa der û devera”

Go: “Mi her dem distirand  
Çirçirîkim dilorand

Ma ne delal'e ev hal?”  
Mêruwî go “Ey heval

Heger ev karek rind bê  
Niha bigre govendê”

**La Fontaine**

Werger: Irşad Seyda

# VILÎ ÇIL- MISKYENÊ

Ey gula reyhanî  
Vilika cinnetî  
Ziwanan di ti çinya  
Qelban di ti çinya  
Ayatê eşqî nêwaneyênê  
Xezeb vareno însana ser  
Bi destan de însanana

Qur'an bî xerîb  
Welat bî xerîb marê  
Xarîbey zora ya Muhammed  
To zî dî ya Muhammed  
To zî dî  
Mekke di, Taîf di

Cayo ki ti çinêbê ya Muhammed  
Deyenê eskencero  
Dêrsim'di çebyenê adir  
Bi tanqana pay benê Sîwerek di  
Însanî

Yaxerê rehmetî nêvarenê ya Muhammed  
Tim gunî varena  
Ew gunî herikyena  
Azmîn ra, layan ra  
Rî welatî bi hêsla welat bi guniya şo ya  
Ew ma tim bi zer ya şikatêyo jîn bî

Zîlan'di aw nê, gunî herikyena  
Helebçey vinî benê xerîteyan ra  
Ew ma tim Helebçeyan di jîn benê

Cayo ki ti çinêbê ya Muhammed  
Kîmyasala ceribnenê sêkuran ser  
Zilm vareno heme ca di  
Zey torga zimistanî

Însanê ma yenê kişten  
Hergi roj fermanî waneyênê  
Qelemî şikyenê hakiman dest

Ma fina zî bi ûmida jîn benê  
Bi ûmida warzenê xwu ser  
Bi ûmida abyenê hergi şefaq

Omer Faruk Çetinkaplan

# RIYÊ XWU BISAW AZMÎN

-Teleba da mirê-

Riyê xwu bisaw azmîn  
Istaran bigî xwu dest  
Zey vilan ak destanê xwu  
Ak Homay rê/Wa rindey bivaro

Qelbê to zey qestelê rindey  
Zerî da to di vilî deste bi deste  
Wa çimê to bihuwiyê  
Cennetî abyê rîdê to di

Bi huwî fina  
Wa çiman dê to di vinî ba ez  
Ti vayana piya yena  
Ti en gula xasek a

Muhammed Paşa

**nûbihar**

**Kitêbên me yên li ber  
çapê:**

- 1- Nimêj Dikim
- 2- Bediuzzaman'ın Volkan  
Yazılıları

## *“Em bawerin ku hun ê bibin hêviya hemû xwendavanên misliman û kurd”*

Xebatkarê Nûbihar,

Xweda yê Aleman di xebata we de dijvariye nede we. Berî her tiştî ez ê tebrîkê xwe ji we re bibêjim. Hun jî gereke bizanibin ku çavên me li riya we bû. Em li benda kovareke İslâmî ya Kurdî bûn û we jî ev pirsgirêka me yî herî mezin ferisand. Ji bona vê xebata we, em ji we re gelek spas dikan. Ez û du sê hevalên xwe, xwendavanên we ne. Wê vêya jî wisa bidom e, inşaelah. Em baweriye dikan ku hun ê bibin hêviya hemû xwendavanên misliman û Kurd. Ev jî ne dûr e, geleki nêzîk e. Weke tê zanîn, ola me İslâm, oleke alemdişti ye. Ji bona ku hun jî ola me di kovara me yî Nûbihar de, pêş me dikan û tînin zimên û bi me hîn dikan, em ji we re çi bikin jî hindik e. Lewra em ji ola xwe zehf dûr ketinîn. Di nav gelê me de kes nikare bibêje ev mîr, ev zarok, ev jîn, ev xort di riya İslâmî de dimeşe. Em hevqasi ji ola xwe dûr ketinîn ku em nizanîn bê çi bikin û em dikevin nav hevdu. Ev jî tiştekî pirr xerab e. Ji ber ku we me kir xwediye kovareke İslâmî, em kîfxweş bûn. Û em dîsa ji we re spas dikan.

Nivîskarê Nûbihar,

Ez ê li vir du sê rexneyên xwe bînim zimên.

Ya pêşî ev e: Hun ferhengokê pirr kurt di- weşînîn. Ko hun ferhengokê zêdetir bikin wê zehf rind bibe. Lewra pirr hevalên me yêñ xwendavanên kovara me, di vê pirsgirêkê de dijvariye dikşînîn û rexneyên xwe tînin zimên. Bi rastî, gellek bêjeyênu ku di kovarê de têñ weşandin, em jî ma- na wan nizanîn. Ev jî ji bona xwendavanen tişteke xirab e.

Rexna duyemîn ev e: Hun di kovarê de cih nadîn peyivên pêşîyan... Hal ev e ku em ji peyivên pêşîyan ti tiştî nizanîn. Ev jî ne tişteke rind e. Ko hun nîv rûpelê an jî du sê setiran ji wan biweşînîn, wê xweş be.

Rexna min î sêyemîn ev e: Ko hûn di kovarê de pelkê ji bona jiyanname û têkoşîna alîmîn me biweşînîn, wê pirr rind bibe. Her wekî we di kovarê de jiyanname û têkoşîna Bedfuzeman weşandibe jî em dixwazin ku di her hejmarê de bidome. Lewra ev, ji bona xwendavanen gellek lazim e. Lî ev ne rexne ne, hemû rica ne.

Xebatkarê Nûbihar, Hun alîkarê mazlûman in û hemû misliman jî. Em jî vê aye-

ta Xweda dinivîsin. Ko hûn di kovarê de biweşînîn wê gellek baş be.

“Çi bi we hatiye ku hûn cengê nakin; di riya Xwedê de û ya wan musted’efanên mîr û jîn û zarok, ku dibêjin: “Ya Reb! Me ji vî welatê ku xwediye wî zâlim in, derxîne û ji me re ji ba Xwe xwediye kî bişîne û ji me re ji ba Xwe arî-

karekî bişîne” ” (Nisa: 75)

Daxwazek me ji xwendavanen jî heye: Hemû xwendavanen, li kovara xwe xwedî derkevin û bixwînî!

Selam û rehmet û berreketa Xweda li ser we û hemû mislimana be. Esselamû eleykum.

Ahmet Dinç

## *“Daxwaza me ji Xwedê ew e ku, em rabin ser lingê xwe, dermanan li ser birîn û kulê xwe bireşînîn”*

Bismillahirremanirrehîm

Esselamû eleykum we rehmetullahî we berkatuhu ebeden dai- men.

Ey xebatkarê kova- ra Nûbihar!

Ji vê xebatê re ez zor spas dîkim. Inşaelah em ê jiyanâ Nûbihar a xwe bidomîn, abone peyda bikin û bidin xwendin.

Ey birayê me yêñ de- lal!

Kurd îro di welatê xwe de tête kuştin, koçber dibe. Çand û huner û edebiyata xwe jîbîr kiriye; zimanê wî hatiye qedexekirin. Xizanî û nezanî pergala Kurdish belav kiriye.

Ez ji we lava dîkim. Bi xebatê xwe, ji van kul û birîna re li çaran bigerin û peyda bikin.

Kovara Nûbihar de ji bo dîroka Kurdistanê rûpelekê vezin. Jiyanname û têkoşîna mezinî

Kurdan binivîsin. Hun ferhengokê jî hinek zêde bikin, ez ê pir şanaz bibim.

Welhasil birînê me zehf in, derdê me mezin e, ji destê me tiştek nayê dest û lingê me giředane.

Daxwaza me ji Xwedê ew e ku, em rabin ser lingê xwe, dermanan li ser birîn û kulê xwe bireşînîn. Ji bin destê zâlim û zordestan derkevin. Ji Gulistanê dagirkeran derxînîn. Welatê xwe de şerîfetê damezrînîn. Ji bo vana em hêvîdarin.

Ey xwendavanê Nûbihar! Pir bixwînîn. Îxtîafê ji nav xwe rakîn. Yekwucûd bibin. Ji welatê xwe re bixebeitin. Xizanî bavêjin ji diyarê me.

Selam û rehmeta Xwedê li ser we be. Xebatê we da Yezdan alîkarê we be.

M. Heggî Rîşwanî

# FERHENGOK

**A**  
**Afirandin:** Yaratmak, meyda-na getirmek  
**Agah:** Haberdar, bilinçli  
**Aram:** Sakin  
**Arînjad:** Ari kökenli  
**Aso:** Ufuk  
**Asteng:** Engel  
**Axaftin:** Konuşma, hitap

**B**  
**Balkêş:** İlgi çekici  
**Belam:** Fakat, lakin  
**Berhem:** Eser  
**Beşdarî:** Katılım, iştirak  
**Beyankar:** Belirleyici, açıklayı-  
**C**  
**Birêvebir:** İdareci, müdür  
**Biyanî:** Yabancı  
**Büyer:** Olay

**Celeb:** Çeşit, nitelik, vasif  
**Ceribandin:** Denemek

**Ç**  
**Çaplûsi:** Dalkavukluk  
**Çareser:** Çözüm  
**Çewti:** Yanlışlık  
**Çikos:** Cimri  
**Çırçırık:** Cırcır böceği  
**Çong:** Diz

**D**  
**Damezirandin:** Kurmak  
**Devok:** Şive  
**Dezgeh:** Tezgah  
**Digel:** Beraber, birlikte  
**Dijîti:** Karşılık  
**Dîlovanî:** Merhamet  
**Durr:** Cevher

**F**  
**Ferisandin:** Halletmek, çözmek

**G**  
**Gengeşî:** Munazara  
**Gerdanaza:** Serbest, özgür  
**Gerînende:** Direktör, müdür  
**Girîng:** Önemli, mühim  
**Gorî:** Kurban, fedakar

**H**  
**Hawêrxweş:** Etrafi şen  
**Hêja:** Değer, kıymet  
**Helsengandin:** Tartmak, de-ğerlendirmek  
**Hewl:** Gayret, çaba  
**Heyam:** Çağ  
**Hîm:** Esas, temel

**K**  
**Kahnî:** Çeşme  
**Kambaxî:** Olumsuzluk, mut-suzluk  
**Kêrhatin:** Faydalı olmak  
**Keşti:** Gemi  
**Kêzik:** Böcek  
**Kinc:** Elbise  
**Kirêt:** Kirli, pis  
**Kiyan:** Üstün,  
**Koçberî:** Sürgün  
**Komar:** Cumhuriyet  
**Komele:** Cemiyet  
**Komik:** Grup  
**Korekorane:** Bağnazca, körü-körüne  
**Kurm:** Kurt, kurtçuk

**L**  
**Leheng:** Yiğit, kahraman  
**Lêkolîn:** Araştırma, inceleme

**M**  
**Mamoste:** Öğretmen  
**Mebest:** Maksat, hedef  
**Merc:** Şart  
**Merdûd:** Reddedilmiş  
**Mertal:** Kalkan  
**Mérû:** Karınca  
**Mêrxas:** Cesur, yiğit  
**Mînak:** Örnek  
**Mijûl:** Meşgul

**N**  
**Navdank:** Kimlik  
**Naiverok:** İçindekiler  
**Nepen:** Peçeli, üstü örtülü  
**Netewe:** Ulus  
**Nevînî:** Hoşnutsuzluk  
**Nîr:** Çağ  
**Nik:** Yanı, yanında  
**Nıştiman:** Vatan, yurt  
**Nûçe:** Haber  
**Nûjen:** Modern  
**Nuqurç:** Çimdirik

**P**  
**Parastin:** Koruma, muhafaza  
**Parvebûn:** Parçalanma  
**Pejirandin:** Kabul etmek, seç-mek, tercih etmek  
**Pergal:** Statu, durum  
**Perwerde:** Eğitim  
**Pêşbazî:** Musabaka  
**Pêşeroj:** Gelecek, istikbal  
**Pêşkêş:** Sunma, arz etme  
**Pêvajo:** Süreç  
**Pêwendî:** İlgi, alaka  
**Pexîl:** Kiskanç  
**Pirralî:** Çok yönlü

**Pispor:** Uzman, bilirkişi  
**R**  
**Rabirdû:** Mazi, geçmiş  
**Raman:** Düşünce  
**Rêheval:** Yoldaş  
**Rewş:** Durum  
**Rexne:** Eleştiri  
**Rim:** Mızrak  
**Rizyatî:** Eskimiş  
**Rojev:** Gündem  
**Rojhilatanavîn:** Ortadoğu  
**Rûpiş:** Yüzölçümü

**S**  
**Salox:** Tarif, izah  
**Salveger:** Yıldönümü  
**Sazgeh:** Kurum, kuruluş  
**Serfiraz:** Muzaffer, galip  
**Serkevtin:** Başarı  
**Sosret:** Gülünç, komik  
**Statîk:** Durgun, değişmez  
**Stayış:** Övme  
**Stockholm:** İsveç'in başkenti

**Ş**  
**Şanazî:** İftihar  
**Şermezar:** Utanç  
**Şewe:** Şive  
**Şopajotin:** Iz sürmek

**T**  
**Têkilî:** Karışmak, müdahale et-mek  
**Têkûz:** Kuvvetli  
**Tengijîn:** Öfkelenmek  
**Teşe:** Tür, biçim  
**Tevger:** Hareket, eylem

**V**  
**Vêca:** Böylece, o halde

**W**  
**War:** Yer  
**Warê ceribandinê:** Deneme-yeri

**X**  
**Xaçî:** Haçlı  
**Xewrojk:** Hayal  
**Xwîxweş:** İyi huylu

**Y**  
**Yekta:** Biricik, yegane

**Z**  
**Zagon:** Kanun  
**Zargotin:** Şive  
**Zexim:** Kuvvetli  
**Zorbir:** Galip, yenен

## ÇEPELAST

1- Di dînê Zerduştî de navê peyxambere-kî ye, serbajarê herêma Kurdistana rohilat, li Iranê - Hejmarekî 2- Di navbera Tetwan û Bidlis de xanekî kevn - Kurt, dijraberî dirêj 3- Term, mirî - Temar, reg, reh - Asan, hêsan, erzan 4- Hesin - Sol 5- Di muzikê de notayekî - (Berepaş) ferşenî, nêtik 6- Di alfaba erebî de herfekî (Berepaş) 7- Mizgeft - Şexis, şexs 8- (Berepaş) Mil, pil - Navê darekî 9- Xurek, xurdemêni - Di Mekkê de çiyayekî, di navbera meydana cennet û cehennem 10- (Berepaş) Sahib, xawen, xudan - Cihê hecê, beytullah 11- (Berepaş) agir - Bîhnetkin, bînubûn 12- Pîvanekî 2.54 cm - El, ezbet, taife

## SEREJÊR


1- Sala 1570 li Cizîrê hatiye dinyayê. Pişti çilsaliya xwe dest bi nişandina dîwana xwe dike. Ji Mîrê Cizîrê re helbest nişandine. Mudeteke dirêj, li Diyarbekirê meletî û dersdariya feqîyan dike. Di nav Kurdan de hozanê tewr mezin tê zanîn. Tirba wî tro li nav Cizîrê mîna ziynet tê qebûlkirin. Seydayê hêja sala 1640'an de, heftê saliya xwe de çûye rehmetâ Xwedê. Bi dîwana xweyî navdar tê zanîn (Resmê navê de) 2- (Berepaş) Bang, bangî nimêjî ye - Bager - Mehsûlên şîr 3- Roja qiyametê - Gedeq, asik, zik, hûr 4- (Berepaş) Di erebî de av - Navê mîrekî - Wiha, wer, wisa, wilo 5- Pişî - Xwelî, erd, herrî 6- Di Turkiyê de partiya ku ji tarafê Turgut Özal de hate damizrandin - Xwendina herfekî 7- (Berepaş) Nemir 8- Ereba hespan - Mirok, demî, miweqet 9- Diran - Di dewra bapîrê peyxemberê me de, ew teyrênu ku, êrîşê leşkerên generalê Hebeşistanê (Ebrehe) kirin û wan mexlup kirin 10- Zanko, zanîngeh

## BÜRSİYEN İLE İŞTARAŞ

**ÇEPELAST:** 1- Barzanî - Aş 2- Od - Adem - Ma 3- Sebz - Hazeq 4- Laş - Nûrû 5- Aze - Qıl 6- Heqî 7- El - Ban 8- Al 9- Sînî - Avrêj 10- Enîs - Safra 11- Kab - Liç - Ed 12- Nok - Ab

**SEREJÊR:** 1- Bosna Hersek 2- Ade - Zel - ïnad 3- Bleq - Anîb 4- Zaza - Îblîs 5- Ad - Lo 6- Neh - Asik 7- Îman - Vaç 8- Zîq - Berf 9- Amerîqa - Êreb 10- Şaqûl - Nijad

*Amadekar: Ali Keçeli*



## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe ve ji hejmara [.....] pê ve min bikin aboneya/aboneyeyê kovara Nûbihar.

*Nav û paşnav:*

*Navnisan:*

*Jimareyên hesabê ji bona razandina bedela abonetiyê:*

*Li hundur:* Postgiro (Posta Çekî): Süleyman Çevik, 658265

*Li derive:* Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 - 3118770

Ji kerema xwe ve, Karta Abonatiyê dagirin û tevli kopyeke pela razandina bedela abonetiyê bişinin navnîşana me.

*Navnisan:*

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3 Fatih - İstanbul  
Tel: 533 75 88 / Faks: 524 00 38

*Bedela abonetiyê:*

*Li hundur:* 180.000 TL. *Li derive:* 60 DM.

# KITÊBÊN KU EM BELAV DIKIN

## (DAĞITIMINI YAPTIĞIMIZ KİTAPLAR)

### Kitêbên Kurdî (Kürdçe Kitaplar)

1- Ferheng (Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî) / D. Izoli .....	195.000.-
2- Ferheng (Zazakî-Tirkî) / Malmisanij .....	100.000.-
3- Mamoste Seîdê Norsî (Soranî, bi tîpên Erebî).....	40.000.-
4- Mewlûd / Mele Ehmedê Bateyî .....	20.000.-
5- Nalînê Min / M. Şakirê Koçer.....	10.000.-
6- Nûbar / Ehmedê Xanî.....	15.000.-
7- Peyiva Bîst û Sêyemîn (23. Söz).....	15.000.-
8- Peyivên Piçûk (Küçük Sözler).....	20.000.-
9- Rîsala Biratiyê (Uhuvvet Risalesi).....	15.000.-
10-Rîsala Biratiyê (Bi tîpên Erebî) .....	15.000.-

### Kitêbên Tirkî (Türkçe Kitaplar)

1- Aydînlîk ve Dindarlık / A. Suruç.....	15.000.-
2- Ayet Yorumları / A. Şeriati.....	25.000.-
3- Dini Düşüncenin Yeniden Kurulması / A. Suruç .....	15.000.-
4- İlerici Gericilik / A. Suruç.....	10.000.-
5- İslam Ümmetinin Yetimleri Kürtler / F. Şinnavî .....	15.000.-
6- Kürt Soruşturması / Sor Yayınları.....	40.000-
7- Peygamberler Aydînların Önderleri / A. Suruç .....	15.000.-
8- Şîrnak Baskını / Osman Resulan.....	20.000.-
9- Zamanın Zeynebi / Z. Burucerdi.....	15.000.-

### Kitêbên Erebî (Arapça Kitaplar)

1- Lemalar (el-Leme'at).....	100.000.-
2- Mektubat (el-Mektûbat).....	100.000.-
3- Sözler (el-Kelimat).....	120.000.-

**Kitêbên li jor, bi sih ji sedî (30 %) erzanî têne şandin. Yênu ku hun dix-wezin, navê wan binvisin û ji me re rîbikin. Bihaya wan hesab bikin, ji mecmûa bihayê, 30 % kêm bikin, baqiyê li hesabê jêrê razînin û fotokopyeke pela razandinê, bi mektûba xwe ya ku we navê kitêban tê de nivisandiye, bişînin navnîşana kovara me. Hengava ku mektûba we gîhişte destê me, wê kitêbên we ji we re bêne şandin.)**

(Yukarıdaki kitaplar % 30 indirimle gönderilir. İstediklerinizin adını yazıp bize ulaştırın. Tutarlarını hesaplayın, toplamdan % 30 düşün, geriye kalan tutarı aşağıdaki hesaba yatırın ve ücreti yatırdığınızı gösteren belgenin fotokopisini, istediğiniz kitapların isimlerini ihtiya eden mektupla birlikte dergiminizin adresine gönderin. Mektubunuz elimize ulaşır ulaşmaz, kitaplarınız adresinize postalanacaktır.)

### JIMAREYÊN HESABÊ (HESAP NUMARALARI):

**Li hundir** (Yurt içi): Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

**Li derve** (Yurt dışı): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100 - 3118770

### NAVNIŞAN (ADRES):

Nûbihar Dergisi, Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih / İstanbul

Tel: 533 75 88 Faks: 524 00 38

